rupel 1:Layout 1 10.01.2020 22:13 Page 1

Porê delala min sor e

Di têkoşîna jinan de porsorî bû sembola rika jinan. Sufrajet bi porê xwe yên sor -henekirî- hatin naskirin. Naziyên alman têkoşêra holandî Hannie Schaft bi navê "keçika porsor " teşhîr kir. Saraya kurd bi porê xwe yê sor û kurîşkî bû stirî... *Munevver Azîzoglu Bazan / RÛPEL - 2*

Helbestên kurdên Xorasanê

Bextewariyek e ku parek ji helbestên folklorên kurdî ku di dîrokê de ji bîr nebûne li qalibên wek 'sêxiştî' û 'lo' gihîştine destê nifşên îro û bi hewla lêkolerên îroyîn hatine berhevkirin û weşandin. Ji ber ku belge û destxetên pêwîst hindik in... *Mehbûbe Seadetmend / RÛPEL - 5*

Neyarên veşarî

Ez heyran, hûn çi dixwazin ji min? Qesem dikim bi navê xwedê yek armanceke min a nivîsê heye ew jî; bes pê dilê xwe aş bikim û bêhna xwe derxînim... Ma qey hema kî a dilê xwe, bi du sê rêzikên kurmanciya zelal û bi çend peyvên ku ji ber xwe de li hev tên... *Berfîn Dîcle / RÛPEL - 10*

Rojnameya Heftane

xwebûn

13-19 Çile 2020
Hejmar: 4
Buha: 4 TL

www.xwebun.org
rojname@xwebun.org

Folklora me pişta me ye



NIVÎSKAR BAHOZ BARAN têkildarî ziman û folklora kurdan ji rojnameya me re axivî û wiha got: "Folklor, hîmên netewetiyê, yekitiyê di xwe de dihewîne. Me ber bi hev ve tîne. Ji bo em di gelek warên din de bixebitin ji me re dibe pişt... Kurd, neteweyeke folklorîk in, xwedî gelek rituelên cuda û zengîn in, zargotina wan okyanûsek e. Folklor, oksîjena kurdan e. Folklora me, pişta me ye. "...

Hevpeyvîna Lezgîn Akdenîz / RÛPEL - 4

Ji ber bêderfetiyê cih nedan kurdî!

Dibistana Navîn a Mûş Turk Telekomê, ji bo dayik û bavên zarokan daxwaznameyeke dersên bijarte amade kir û cih neda dersa kurdî. Midûrê dibistanê Yûnûs Guneş diyar kir ku ji ber bêderfetiyê cih nedane kurdî... *RÛPEL - 3*

Ma xwu rê ciya bin!

Ena çekuya "zaza " ke semedê ma yena vatiş, bi hawayê nuştekî reya verîne hetê seyahê tirkî Ewlîya Çelebî (1611-1678) ra ameya şixulnayiş. Neke sey name yan çekuyêka xwusere, nameyê kurdan het sey îzafe Seyahetname de nuşta. Wexto ke behsê Çewlîgî keno, vano "Ekrâd-ı Zaza " û "aşiret-i Zaza ". Yanî, vano "kurdê zaza " û "eşîra zaza ". Beno ke Ewlîya Çelebî ena çeku metnanê... *Roşan Lezgîn / R/ 9*

Veng-deng

Deng nasnameya zindeweran e. Xweza bi dengan afirî û helbet me baweriyên xwe, kesayetên xwe, çanda xwe, dîroka xwe û hestên xwe bi dengan ava kirin. Me bi dengan jiyan nas kir, hestên xwe anku tirs û kêfxweşî û hwd. me bi dengan zanî. Deng amûrek bû, amûrek veguhastinê û bibîrxistinê, helbet bo ew kesên ku xwezayeke giran dijîn, benikek di navbeyna jiyan û mirinê de bû deng...

Kenan Colemêrg / RÛPEL - 5

Şer û qeyranên aborî

Sedemên qeyranan carna diguherin lê di heman demê de qeyran, zirarên gelek mezin didin civakê. Her pêlek, pergalê ser û bin dike û di dawiya xwe de nûjeniyekê derdixe holê... *Remezan Tunç / R.3*

Têkiliya berjewendiyan

Di halê heyî de bi vekirina boriya gazê ya Turk Akimi, Rûsya gihîşt armanca xwe. Têkiliyên bi saya vê peymanê pêşketin, di hin mijarên din de jî herdu dewlet nêzî hev kirin... *Felemez Ulug / R.7*

Jon Tirkan nav guherandin

Jon Tirk di sala 1910'an de navên Alayê Hemîdiyê vediguherînin û dixin "Alayên Eşîretan " an jî "Alayên Eşîretan ên Siwarî " û her wiha ji artêşa navendî serleşkeran dixin nav wan... *Sedat Ulugana / R.8*

Sê nifş û çend pisîk

Wêje pariyekî jî bîr e ma ne? Ya ku di ger û geşta me ya di rêk û xaçerêkên nivîsaran de, xwe bi lêrasthatiniyên bêhnçikîn şanî me dide, helbet dolaba me rast bigere, bextê me lêxe... *Şener Ozmen /R.11*

Di şer de merhaleyeke nû

Şerê Cîhanê yê Sêyemîn roj bi roj kûrtir dibe û erdnîgariya Kurdistanê jî di navenda vî şerî de cih digire. Xeterî û metirsî herî zêde ji bo civaka kurd hene. Lewre herî zêde pêdiviya civaka kurd bi baldariyê heye. Pêdivî bi girtina bergiriyên civakî yên pêwîst heye. Rewşên kaotîk bi qasî ku di xwe de gelek metirsiyan dihewînin, ewqasî jî fersendan jî di xwe de dihewînin. Ev heqîqet bi awayekî zelal ji me re wiha dibêje; erdnîgariya Kurdistanê careke din bê hemdê kurdan dibe qada şerê hêzên hegemon. Ger kurd bibin yek dê welatê xwe biparêzin..

Nûçe-analîza Mehmet Şahîn /RÛPEL - 7

Sersala kurdan

Sersala kevin an jî gelêrî ya 13'ê çileyê li hin deverên Kurdistanê hê jî tê pîrozkirin. Di nav kurdan de bi piranî ciwan û zarok pîroz dikin. Zarok û ciwan xwe dixin şiklên cur bi cur, rûyên xwe boyax dikin an jî teniyê di rûyê xwe didin... *RÛPEL -12*

Sal bi sal xwezî bi par

Dema em biçûk bûn xeyalên me mezin bûn. Em mezin bûn, xeyalên me jî biçûk bûn... Salek din jî ji emrê me çû, ango me pişta salek din jî şikand. Her sala ku derbas dibe em jî pîr dibin. Yanî cîhana ku em tê de ne jî pîr dibe. Ev pîrbûn kevinbûnê jî bi xwe re tîne. Li aliyekî dema tu dinihêrî di vê dema teknolojiyê de her tişt kêlî bi kêlî nû dibe... *RÛPEL - 8*

rupel 2+++:Layout 1 10.01.2020 21:21 Page 1 (Black/Black plate)

Biyan

Munewer Azîzoglu Bazan

‘Porê delala min sor e’

Der barê porê sor de gelek mesel, mît û bawerî hene. Ji dema misiriyan heta dema antîkê, ji serdema navîn a Ewropayê heta Rojhilata Navîn di gelek çand, bawerî û olan de di navbera porê sor û jinê de têkiliyeke yekser hatiye ava kirin. Her çiqas ev têkilî li gor demê, li gor helwestên serdest, li gor pêşdarazî û biryarên giyana dema xwe biguhere jî porê sor di dîrokê de bi du awayan hatiye temsîlkirin: ji hêlekê ve bi hêza jînê, vîn, evîn û hestê, ji hêla din ve bi xwîn, mirin, agir û dojehê tê pênasekirin.

Bi kîjan awayî dibe bila bibe, porê sor di heman demê de bûye yek ji nîşaneyên serhildan û îsyanê û her wiha yek ji sembolên femînîzmê. Porê sor di dîroka femînîzmê û tevgerên jinan de ‘berxwedana estetîk a kolektîv’ temsîl dike. ‘Estetîka jinê’ li dijî bîrdoziya laşî ku jinê ji xwezaya wê dûr xist û li gorî zilam estetîze kir, di salên 1960’î de wek antîtez derket pêş. Jinan ‘laşê çêkirî’ protesto kir. Ne tenê mêtingeriya xwezaya civakî ya jinê, di heman demê de rexneya danûstandina bi jinê kirin mijarên teorî û pratîkên xwe. Porê sor di vê çarçoveyê de wek helwesteke polîtîk ku hewceyî axaftinê nake derket holê. Ev têkilî bingeha xwe ji dîroka keltan distîne. Lewre tê gotin ku di serdema keltan de jin şervanên xurt, xwedî hêzên mîstîk û por sor bûn.

Bi sêr û efsûnê dijminê xwe bi bin dixistin. Bi tirs û xofê dihatin şopandin. Di serdema navîn de ev çîrok bi heman awayî ji bo pîrelkan hat gotin. Pîrelkên porsor bûn nîşaneya li dijî pergalê. Şarezahiya jinê ya ku bi xwezayê re mil bi mil dimeşiya, bû stiriya çavê dêrê. Porê sor bû rengê dojehê, jirêderxistinê, rengê serhildanê, jirêzêderketinê. Li seranserê Ewropayê jinên ji rêzê derketî rastî zext û zordariyê hatin, hatin kuştin û qetilkirin. Ev kevneşopî di serdestiya pergala zilam de di demên cuda de di bin navên cuda de her tim dewam kir. Femînîzm li dijî berevajîkirina dîroka pîrelk û porsoran hemî mîrateya porê sor girt ser xwe. Hem hêza jînê, hem a mirinê. Di têkoşîna jinan a ji bo wekheviyê de porsorî bû sembola rika jinan. Sufrajet bi porên xwe yên sor - henekirî- hatin naskirin. Naziyên alman têkoşêra hollandî Hannie Schaft bi navê ‘keçika porsor’ teşhîr kir. Saraya kurd bi porê xwe yê sor û kurîşk bû stirî; ket çavê dêrên vê demê, bû temsîla jina jirêzêderketî. Bi vî awayî porê sor “estetîka têkoşînê” bi “estetîka jinê” ve girê da. Ji ber vê yekê ye ku jinên têkoşer bi çi rengî dibin bila bibin her tim porsor in.

Divê berjewendiyên neteweyî li pêş bin

Aktîvîsta TJA'yê Ayşe Gokkan diyar kir ku li her derê êrîş tên kirin, heke kurd nebin kes nikare pêşiya van êrîşan bigire û da zanîn ku divê her tim berjewendiyên neteweyî li pêş bin

Berîtan Canozer - Medya Uren / **Amed**

Xebatên ji bo lidarxistina kongreya yekitiya neteweyî ya kurd, ji sala 2013’an ve bi awayekî çalak li çar parçeyên Kurdistanê tên kirin. Çawa ku di hemû mijarên civakî de li pêş in, jinên kurd di mijara yekitiya neteweyî ya kurd de jî pêşengiyê dikin.

Jinên kurd ên çar parçeyên Kurdistanê, ji bo pêkanîna yekitiyê di 22’yê kanûna 2017’an de Platforma Yekitiya Jinên Kurd saz kir. Jin di bin banê vê platformê de, gelek xebat kirin, bi jinên parçeyên din re hatin gel hev û têkildarî lidarxistina kongreyê civîn li dar xistin.

Herî dawî platformê bi boneya salvegera damezirinadina xwe bi dirûşma ‘Em ji vê derê ne, em li vê derê ne, azadiya me yekitiya me ye’ li hev civiyan. Dezgehên kurd, partiyên siyasî yên kurd, înîsiyatîfa jinên kurd û tevgerên jinan li hev civiyan û li ser mijarên sereke rawestiyan. Di civînê de endamên platformê ku bal kişandin ser girîngiya yekitiyê, gotin ku jinên kurd ji yekitiya neteweyî re pêşengiyê dikin û vê bangê kirin: “Kurdno! Bibin yek. Ger ku hûn nebin yek hûn ê herin yek bi yek.”

Firsendên zêrîn

Jinên tev li civînê bûn axivîn û diyar kirin ku şert û mercên heyî li kurdan yekitiyê ferz dikin û dan zanîn ku dîrok ji bo kurdan firsendên zêrîn afirandiya û azadiya kurd û Kurdistanê bi yekitiyê pêkan e.

Têkildarî nîqaşên li ser yekitiyê, encamên platformê, êrîşên li ser Kurdistanê û jinên kurd aktîvîsta Tevgera Jinên Azad (TJA) Ayşe Gokkan nirxandin kir. Gokkan diyar kir ku heke kurd nebin yek dê ji qirkirin û polîtîkayên mêtingeriyê rizgar nebin.

Mercên heyî û yekitî

Gokkan di axaftina xwe de bal kişand ser encamnameya platformê û ev tişt anî ziman: “Cara yekem di sala 2010’an de li Amedê û piştî wê di sala 2013’an de jî li Hewlêrê me konferansên jinên kurd li dar xistin. Ji derveyî van em dem bi dem kom bûn. Niha jî em ji bo avakirina yekitiya neteweyî dixebitin. Lê êrîş û qirkirinên li ser bakur, başûr, rojhilat û rojavayê Kurdistanê berdewam dikin. Divê gelê kurd li hember êrîşên li dijî nirxên xwe bibin yek. Şert û mercên heyî yekitiyê li me ferz dike. Di hemû civînan de li ser pêvajoyê şîroveyên bi nirx hatin kirin. Bi nîqaşkirina pirsgirêka kurd re her tim bi yek dengî hat gotin ku jin dê bikaribin pêşengiya çareserkirina pirsgirêka kurd bikin û ji bo yekitiyê gavan biavêjin. Me xebatên xwe di bin vê dirûşmê de berdewam kirin.”

Helwesteke xurt divê

Di civîna platformê de êrîşên li ser kurd û Kurdistanê, binpêkirina mafan û pirsgirêkên heyî bi berfirehî hatin nîqaşkirin. Der barê van nîqaşan de Gokkan ev tişt parve kir: “Ev êrîşên ku li hemberî gelê kurd divê bi hêsanî neyên destgirtin. Êrîşeke tunekirinê berdewam e. Divê em li dijî van êrîşan bibin yek û helwesteke xurt nîşan bidin. Ger kurd yekitiya neteweyî ava nekin wê qirkirin û bişaftina kurdan ti carî bi dawî nebe. Wê ev binketin her

tim berdewam bike. Divê ti kurd berjewendiya kesî nefikire û ji bo yekitiya neteweyî gav biavêje. Ev erk û bar a me tevan e. Ev êrîş ne tenê li ser parçeyên Kurdistanê tên pêkanîn, êrîşek li dijî statuya kurdan e. Platforma me weke her carê bi tifaqbûnê bi encam bû. Bi heman hest û ramanan me yekbûnê kir armanc.”

Polîtîkayên asîmlasyonê

Gokkan di axaftina xwe de bal kişan ser polîtîkayên asîmlasyonê û êrîşên li ser jinên kurd û wiha pêde çû: “Li her deverî êrîşeke nîjadperest li ser kurdan tê meşandin ku ev yek pirsgirêka dewamî ye. Ligel wê di navxweyî de jî hişmendiyeke zayendperest rû daye. Êrîşek li ser ziman, çand û nasnameya jinên kurd tê meşandin. Sedema kombûn û piştevaniya me ya yekem ev e. Gotin û berteka me ya li dijî vê yekê tim aşkera ye ku em ê destûr nedin van êrîşan. Ji bo xirakirina van lîstokên qirêj dê jinên kurd tim şiyar bin û li hemberî wê têbikoşe. Yek ji mînaka berxwedanê jî Hevrîn Xelef e. Qetilkirin û êrîşa li ser wê pêkhatiye nêzîkatiya hikûmet, hêzên paremîlîter û DAIŞ’ê ya li ser jinên kurd aşkera dike.”

Banga yekitiyê

Di dawiya axaftina xwe de Gokkan vê bangê li jinên kurd û hemû kurdistaniyan kir: “Armanca hêzên derve tim parçekirina kurdan e. Ji ber wê sedemê di nav xwe de aloziyan ava dikin. Divê em pêşî li van kiryaran bigirin. Weke jinên kurd em dikarin bibin navbeynkarê yekitiyê. Kesên ku pêşengiyê ji vê yekê re bikin bêguman jin in. Bi yekitiya me dê yekbûna Kurdistanê pêk were.”

Efûya îstîsmarkirina zarokan nabe

Hefta borî mijara sereke ya jinan îstîsmarkirina zarokan û pêşnûmeya efûyê bû ku rê li ber zewicandina îstîsmarkirina zarokan vedike. Ev pêşnûmeya ku pêşiya îstîsmarê vedike rastî bertekan hat.

Mijarên sereke wiha bûn:

✓ Li çar parçeyên Kurdistanê û seransarê cîhanê jinên kurd û azadîxwaz jinên siyasetmedar ên kurd Sakîne Cansiz, Leyla Şaylemez û Fîdan Dogan ku di 9’ê Çileya 2013’an de li paytexta Fransa Parîsê hatin qetilkirin û Sêvê Demîr, Fatma Uyar û Pakîze Nayir ku di 6’ê Çileya 2016’an de di dema qedexeya derketina derve ya li Silopiyayê de hatin qetilkirin, bi meş, daxuyanî û çalakiyên cur bi cur bi bîr anîn.

✓ Koordînasyona Jinan a Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê li hemû kantonan civînên xwe yên salane pêk anîn. Di civînan de jinan kar û xebatên salekê nîqaş kirin û her wiha plan û projeyên xwe yên ji bo sala 2020’an jî diyar kirin.

✓ Hikûmeta AKP’ê hewl dide pêşnûmeya ‘Efûyê ya rê li ber zewicandina îstîsmarkirina zarokan vedike’ ya ku di mijdara 2016’an de anîbû meclisê, dîsa bixe rojeva meclisê û bide qebûlkirin. Di vê pêşnûmeya hikûmetê de, tê diyarkirin ku ger faîl û bersûcên îstîsmarkarê zarokan kirine, bi zarokên mexdûr re bizewicin dê cezayê wan bê taloqkirin.Vê pêşnûmeyê di raya giştî de rê li ber nîqaşan vekirin. Li dijî vê pêşnûmeyê gelek komele, meclis, platform, aktîvîst, sazî û dezgehên jinan li gelek bajaran daketin qadan û diyar kirin ku dê destûr nedin ku pêşnûmeya ‘efûyê’ di meclisê de bê qebûlkirin.

✓ Jinên femînîst di sala 2016'an de bi navê Demîr Leblebî komek ava kirine. Kom li ser esasê ‘Civakeke bê şîdet û li ser esasên wekheviyê li Tirkiyeyê aştî’ hatiye avakirin. Di vê çarçoveyê de Komeleya Jinan a Demîr Leblebî ku navenda wê li Enqereyê ye, bi dirûşma ‘Min ji xeyalên xwe aştî çêkir’ projeya atolyeya ‘Aştî Xeyal’ li Mêrsînê da destpêkirin. Atolyeya ku di 11’ê çileyê de vebû dê heta 17’ê çileyê bidome. ***AMED***

rupel 3++:Layout 1 10.01.2020 20:39 Page 1 (Black/Black plate)

Ji bêderfetî cih nedane kurdî!

Dibistana Navîn a Mûş Turk Telekomê, ji bo dersên bijarte cih neda kurdî. Midûrê dibistanê Yûnûs Guneş got ku ji ber bêderfetiyan cih nedanê kurdî

Qedrî Esen

Piştî tekoşîna bi salan a kurdan, di sala 2012'an de di bin navê ziman û devokên ku li Tirkiyeyê dijîn de kurdî weke dersa bijarte hat qebûlkirin. Piştî vê qebûlkirinê, di dîroka komarê de cara yekem li dibistanên Tirkiyeyê dersên kurdî bêyî mamosteyên zimanê kurdî hatin dayîn. Lewre dewlet heta roja vî mafî qebûl bike jî, destûr nedida ku perwerdeya kurdî bê dayîn û mamosteyên kurdî bên gihandin.

Jixwe qebûlkirina dersên bijarte yên kurdî nayê wateya qebûlkirina perwerdeya bi kurdî. Ev tenê weke hînbûna kurdî hatiye qebûlkirin. Weke dersa bijarte qebûl kirine, lê ji bo ku neyê dayîn û zarokên kurd serî lê nedin, çi ji destê dewletê tê dike. Weke mînak, li gel ku 8 sal in ev yek qebûl kiriye jî heta niha tenê 59 mamoste ji bo van dersan tayîn kirine.

Dersên olî ferz dikin

Dîsa bi hinceta ku mamosteyên vê dersê tune ne, li Kurdistanê berê zarokên kurd didin dersên bijarte yên olî. Li navenda Mûşê ev yek aşkera hat kirin. Rêveberiya Dibistana Navîn a Mûş Turk Telekomê ji bo serdema duyemîn a dibistanan ku dema serlêdana dersên bijarte di 9'ê çileyê de bû, jê dayik û bavên zarokan re daxwaznameyeke dersên bijarte amade kir û cih neda kurdî. Li şûna kurdî, van her sê dersên bijarte "Qur'ana Kerîm, Jiyana Pêxemberê Me û Agahiyên Bingehîn ên Olî" yên olî li zarokên kurd ferz kirin.

Berteka li daxwaznameyê

Hîndekarê Beşa Wêje û Zimanê Kurdî ya Zanîngeha Mûş Alparslanê Hatîp Erdogmûş, daxwaznameya ku ji bo hilbijartina dersên bijarte li xwendekaran hatiye belavkirin, li ser hesabê xwe yê Tiwîtterê parve kir. Erdogmûş bi van gotinan: "Mixabin di der sên bijarte de gelek dibistan cih nadin dersa Zimanên Dijîn. Ev jî mînaka daxwaznameya dibis tana keça min e. Xwendekar nikarin dersên kurmancî û kirmanckî hilbijêrin. Hejmara kesên dersê tercîh bikin kontenjana mamosteyê ku ji bo dersê bê tayînkirin jî diyar dike." bertek nîşanê cihnedayîna kurdî da.

Piştî ku min vê parvekirina Hîndekar Hatîp Erdogmûş dît, li Midûriyeta Perwerdeya Neteweyî ya Mûşê geriyam û xwest ku sedema cihnedayîna kurdî hîn bibim. Rayedarên midûriyetê pirsên min ên têkildarî mijarê bê bersiv hiştin û ez aresteyî Midûrê Dibistana Navîn a Mûş Turk Telekomê Yûnûs Guneş kirim.

Dikarin îzah bikin!

Dema ku min sedema cihnedayina dersên kurdî ya di daxwaznameyê de ji Guneş pirsî, ev bersiv da min: "Daxwaznameya ku me amade kiriye, di fermiyetê de tu girêdaneke wê tune ye. Heke malbat, kurdî li waneyên ku me nivîsandine zêde bikin û ji me re bişînin, em ê vê dersê jî bidin." Lê li ser pirsa 'Heke wisa be we ji ber çi cih nedaye kurdî?' berovajiyê bersiva xwe ya destpêkê Guneş, ev tişt got: "Ne tenê kurdî, me cih nedane çend dersên din jî. Ji ber ku mamosteyên me yên kurdî tune ne me cih neda kurdî. Heke mamosteyên me yên kurdî hebûna dê me cih bidana kurdî jî. Ji ber bêderfetiyan tiştekî em bikin tune ye."

Li ser bibîrxistina parvekirina Hîndekar Hatîp Erdogmûş jî Guneş, bertek nîşan da got ku li şûna li ser medyaya civakî parvekirinan dikin û rewşê tînin ziman, bila bên cem me em ê ji wan re rewşê îzah bikin.



Velisi bulunduğum aşağıda bilgileri verilen öğrencinin 2020-2021 eğitim öğretim yılında aşağıda belirtilen toplamda saatlik seçmeli dersleri almasını istiyorum. Gereğini bilgilerinize arz ederim.

ÖĞRENCİNİN		VELİNİN	
Adı Soyadı		Adı Soyadı	
T.C. No		Tarih	
Şimdiki Sınıfı			
İmza		İmza	

ORTAOKULLAR İÇİN HAFTALIK SEÇMELİ DERS SEÇİM TABLOSU

SIRA NO	DERSİN ADI	HAFTALIK DERS SAATİ	SEÇİLECEK DERS VE SAA
1	Kur'an-ı Kerim (4)	2 / (4)	
2	Peygamberimizin Hayatı (4)	2	
3	Temel Dinî Bilgiler (2)	2	
4	Okuma Becerileri (1)	2	
5	Yazarlık ve Yazma Becerileri (1)	2	
6	Yabancı Dil(İngilizce) (4)	2	
7	Bilim Uygulamaları (4)	2	
8	Matematik Uygulamaları (4)	2	
9	Görsel Sanatlar (Resim) (4)	2 / (4)	
10	Müzik (4)	2	
11	Spor ve Fiziki Etkinlikler (4)	2	
12	Drama (2)	2	
13	Zeka Oyunları (4)	2	
14	Halk Kültürü (4)	2	
15	Hukuk ve Adalet (2)	2	

• Seçmeli derslerin ortaokul öğrenimi süresince kaç kez alınabileceği dersin adının yanında parantez içinde belirtilmiştir.
• Tabloda yer alan "Haftalık ders saati " bölümünde dersin kaç saatlik olduğu belirtilmiştir.
• Tabloda yer alan "Seçilecek ders ve saati" bölümüne seçilen ders için 2 veya 4 saat olduğunu belirtiniz.

Dest dirêjî zarokan kir

Di salên dawîn de ji ber polîtîkayên bêcezahiştinê, destdirêjî li welat zêde bûye û her roj nûçeyên têkildarî vê mijarê, di çapameniyê de cih digirin. Li gel kesên ku destdirêjiyê dikin tên binçavkirin jî nayên cezakirin û ji ber qanûnên heyî tên berdan. Van kesên ku ji van qanûn û polîtîkayan sûd werdigirin vê kirêtiya xwe berdewam dikin û gelek jin û zarokan mexdûr dikin.

Mînaka herî dawîn a vê mijarê, di nav hefteyê de li navçeya Pêrtag a Dêrsimê hat dîtin. Derket holê ku welatiyê bi navê Harûn Yildirim ku li navçeyê temîra telefonan dike, dest dirêjî gelek zarokên kur ku temenê wan di navbera 11-16'an de ne kiriye û dîmenê van kêliyan kişandiye.

Piştî ku destdirêjî hat bihîstin, li mala Yildirim, lêgerîn hat kirin û dîmenên kêliya destdirêjiyê hatin desteserkirin. Gelê navçeyê, li dijî destdirêjiya Yildirim çalakî li dar xist û xwest bûyer bê ronîkirin û bi cezayê herî giran bê cezakirin. ***DÊRSIM***

Aykol rojnameya me nirxand

Navenda Nûçeyan

Rojnameger Huseyîn Aykol ku 30 sal in di çapemeniya azad de xwedî kedeke mezin e, di 8'ê çileyê de ji bo destnîşankirina pirtûka xwe ya bi navê "Di Demên Ciyawaz De Jiyan" hat Amedê. Aykol, pirtûka xwe ya ku tê de qala 30 salên çapameniya azad dike, li Pirtûkxaneya Lîlavê, ji xwînerên xwe re destnîşan kir.

Aykol piştî destnîşankirina pirtûka xwe ji rojnameya me Xwebûnê re axivî û têkildarî çapameniya azad û rojnameya me Xwebûnê nirxandin kirin. Aykol, diyar kir ku beriya çapameniya azad, 15 salan di sazî û dezgehên çapemeniyê yên cuda de jî xebitiye û ev tişt got: "Beriya ku derbasî çapemeniya azad bibim jî ez di nav karê çapemenî û weşanê de bûm. Her çiqas wekî çapemeniya azad 30 sal be jî 45 sal in ku di nav karê çapemeniyê de me."

'Em îro dîsa li ser pêyan e'

Aykol ê ku bi salan kedeke mezin daye rojnameyê Halkin Gerçegî, Ozgur Ulke, Ozgur Gundemê û hwd. bi van gotinan qala rojnamegeriya kurdî kir: "Ji sala 1992'yan heta niha nêzî 8 rojnameyên kurmancî li bakur hatine çapkirin. Her çiqas ez bi kurmancî nizanibim jî, min hevkariya rojnameyên kurdî kiriye. Pirsgirêkên li ser rojnamegeriya kurdî dizanim. Di hêla belavkirin, çapkirin, derxistinê de xebatkarên me gelek pirsgirêk jiyane. Rojname hatine girtin û pir zêde bedel hatine dayîn. Gelê kurd û hevalên gelê kurd çiqas bedel dabin, rojnameyên me jî ewqas bedel dane. Digel ku bombe hatibin teqandin jî em îro dîsa li ser pêyan e. "

Rojname pêwîstiyek bû

Di dawiya axaftina xwe de Aykol têkildarî rojnameya me axivî û ev tişt gotin: "Em bi zor û zahmetiyan rojnameyên xwe çap dikin. Me nêzî 60 rojnemayên kurdî û tirkî derxistine. Piştî qedexekirina rojnemeya dawî (Welat) êdî pêwîst bû ku rojnemeyeke bi zimanê kurdî dest bi weşanê bike. Heftane jî be dest bi weşanê kir. Hevî dikim ku emrê wê dirêj be."

Aborî û Civak

Remezan Tunç
ramazan.tunc@live.com

Şer û qeyranên aborî

Di ruhê kapîtalizmê de qeyran hene. Lewra aborînasên wek Karl Marx, Schumpeter û Kontratîev li ser "pêlên demkî" ên qeyranan sekinîne û analîzên li ser jiyana civakê li gor van pêlan nirxandine. Sedemên qeyranan, carna diguherin lê di heman demê de qeyran, zirarên gelek mezin didin civakan. Her pêlek, pergalê ser û bin dike û di dawiyê de nûjeniyek derdixe holê. Li gor Schumpeter ev pêvajoyek xwexerakirin û jinûveavakirinê ye. Her ciqas ev pêl, girêdayî bazara azad bin jî, li hin ergdingeriyan qeyranên aborî ji hev cuda dibin. Li Tirkiyeyê qeyrana herî mezin Pirsgirêka kurd û Kurdistanê ye ku ji derveyî qeyrana pergala navneteweyî bandoreke mezin li ser aboriya Tirkiyeyê dike. Di qirnê 21'an de em dikarin bibêjin ku pêşketinên teknolojiyê bandor li ser civakê jî gelek zêde kiriye ku ev merhelyeke qeyranên bazirganî û karên navnetewî ye. Ev qirn wek qirnê "Endustrî 4.0" tê binavkirin. Civaka endustriyalîst jî wek "Civaka 5.0" tê binavkirin. Nîşaneyek Aboriya makro ya Dahata Neteweyî ya Giştî (DNG)'e. DNG ku li gorî hilberîn û zihakirina bûdçeyê tê amadekerin, derfetê dide ku mirov aboriyên cuda bide berhev û mezinbûn û biçukbûna aboriyê binirxîne.

Di pêvajoya "Endustrî 4.0" û "Civaka 5.0"de dahata neteweyî ya giştî ya 2019'an a cîhanê nêzikî 87 trilyon Dolarê Amerîkî (DA) ye û ji vê dahatê para herî mezin a dewlet û welatên ku di bazara azad de kar û xebatên xwe dikin. Di nav vê parê de para herî mezin a Dewletên Yekgirtî yên Amerîkayê(DYA) ye, ku nirxa wê jî 21 Trilyon 350 bilyon(milyar)ê DA ye. Li gor reqemên Fona Pere ya Navneteweyî (IMF)'ê, Tirkiyeyê ku di nezikbûna Yekitiya Ewropya (YE) de bi tesîra reforman dahata xwe heta 950 bilyon(milyar) DA derxist, piştî 2013'an heta niha ji vê dahata mezin a neteweyî heliya û daket 733 bilyon DA'yî. Sedema herî mezin ji bo vê helîna dahata Tirkiyeyê, jirêderketina hiqûq û demokrasiyê ye. Qeyrana di pergala hiqûq û demokrasiyê de bi demdirêjî bandor li ser aboriyê jî dike û dahata kesan, sektoran û dahata neteweyî ya giştî dadixe. Pirsgirêka kurd û Kurdistanê meseleyek e ku ga pir diêşîne.

Ferhenga Aborî û Fînansê

Nîşane(indicator): Pîvaneke stastîk ku ji bo texmînkirina rewşên fînans û aboriyê tê bikaranîn.

Bûdçe(Budget): Texmîna dahat û lêçûnê ku wextekê teqez de hatiye diyarkirin ji bo pêşerojê û di wextên perîodîk de tê çavdêrîkirin

Aborî (Economy): Rêvebirina çavkaniyên heyî yên kêm, rewşa welatekî an jî herêmekê der barê hilberîn, dahat, destketiyê, zihakarî û bazirganiya mal û xizmetan. Hemû karên ji bo pêwîstiyên mirovî bi cih tînin

Fînans(Finance): Termeke ku ji bo hemû xebatên li ser pergala pere, razemenî û amxûrên fînansî tê bikaranîn. Hinek kes fînansê bi kategorî û binkategoriyan jî bi nav dikin. Mînak,Finansa Girseyî.

Dahata Neteweyî ya Giştî (DNG)-Gross Domestic Product (GDP): Hemû nirxên pereyî an jî bazarê ku di navbera demekê de li welatekî ji mal û xizmeta bi dest dikeve.

Endustrî 4.0(Industry 4.0): Pêvajoya şoreşa endustriyê ku li ser otomasyonê, hînkirin û helberîna bi saya maşîneyan, înterneta tiştan (IoT), guherîna dîjîtal tê bikaranîn.

Civak 5.0 (Society 5.0): Civaka ku hemû amûrên Endustrî 4.0 bi kar tîne û ji bo civakeke berxwedêr polîtîkayan diafirîne, civaka biaqil, civaka serwext.

Pêlên Demkî (Business Cycles): Di xwezaya aboriya bazara azad de ji bo ku bazar xwe sererast bike pêlên dem bi dem ku wek qeyrana xwe dide nîşandan.

Hûr bajo dûr bajo ga meêşîne: Ji bo karên demdirêj û hişyarî dide mirovan, kesan ku xwe amade bikin û amurên destê xwe bi hişmendî û zana bikar bînin.

rupel 4+++:Layout 1 10.01.2020 21:30 Page 1 (Black/Black plate)

Folklora me pişta me ye û dema kurd ji zimanê xwe dûr dikevin, ji xwe dûr dikevin

Folklor, oksîjena kurdan e

→ **Lezgîn Akdenîz**

Nivîskar û zimanzan Bahoz Baran li ser giringî, wate û metirsiya li ser zimanî pirsên Xwebûn'ê bersivandin.

Ziman, ne alaveke sîyasî ye ku mirov wî ji bo berjewendiyên xwe bi kar bîne, ew şertê hebûna neteweyekê ye û divê hemû partî bi vê cidiyetê xwe bidin ber meseleyê. Plan, plansazî, polîtîka û bernameya me ya zimanî tune be, em ê têk biçin

Em di serî da qala folklorê bikin, wê pênase bikin. Em çawa maneyê bidinê, çima ewqas girîng e folklor ji bo me? Lazim e em çi bikin ji bo wê?

Wextê dibêjin folklor, ji ber bandora tirkî ye, govend tê bîra gelekan. Folklor, zanist e, zanista gelî ya hezar salan e ku ji tecrûbeyên wî niziliye heta roja îro hatiye; bi her awayî, di her warî de. Ji awayê xweyîkirina heywanan bigirin, heta dirûtin û girêdana cil û bergan, ji hekîmiyê bigirin heta zanîna li ser dar û ber û giyayan, ji ajotina erdan bigirin, heta çandinî û cotkariyê, heta awayê nêçîrvaniyê, ji dawetan bigirin heta şînan...Yanî em qala jiyana neteweyekê dikin. Ji bo ku mirov xwe û neteweya xwe nas bike, lazim e serê ewil mirov folklora xwe baş nas bike, jê ne dûr be; tê de be, ji ber ku ê me kurdan, em parçe bûne, bi zimanê xwe perwerde nebûne, em gelek caran awayê jiyana herêma xwe, folklora herêma xwe, carna yê gundê xwe tenê dizanin; lê folkloreke giştî hebe, ya kurdan e û warê wê jî Kurdistan e. Folklor awayê resen ê jiyana neteweyekê ye. Folklor nayê teqlîtkirin, nayê kopîkirin, lê tê dizîn. Neteweyên din gelekan jê sed du sed sal berê, keresteyên folklora xwe qeyd kirine, li ser wan xebitîne, ew tesnîf kirine. Di ser folklora xwe re hîmên neteweya xwe xurt kirine, ji edebiyatê bigirin, heta warê zanistê, li her derê hûn rastî şopên folklorê tên. Ew ne tiştekî mirî ye, berdewam dike. Ji bo hûn muzîkeke baş hilberînin gerek hûn guh bidin folklora xwe, guh bidin awaz û gotinên berî xwe, zanîna gelê xwe, ji bo edebiyata we baş bibe, gerek zimanê we baş be, zimanê we bigere, zimanekî bi ekl ji we re lazim e, dermanê van hemiyan jî di nav folklorê de ye. Folklora kurdan pir zengîn e, lê kurd pir zêde hay jê tune ne, ji vir sed sal berê di kovara Jînê de nivîskar û rewşenbîrên me kurdan qala zengînî û berhevkariya folklorê dikin; lê folklora me, çand û kelepora me, bi qasî biyaniyan bala me nekişandiye, belkî jî em di nav "wê" de ne loma em nabînin û wekî giyayê hewşê lê hatiye. Lê bi min kesên ku pêşengî kirine, kesên ku di warê weşangeriyê de xebitîne, wan qîmeta vê yekê baş nezaniye. Di kovarên Hawar, Ronahî û Roja Nûyê de, folklor heye her wiha kurdên Kafkasyayê di warê xebatên folklorê de xurt in.

Lê li Bakurê, xebateke baş nehatiye kirin. Wextê berhemeke folklorîk çûye ber destê weşangeran ecêbmayî mane gelek jê. Çimkî ew gelek caran hînî metnên rêzimanî bûne û nema zanîne çi bikin ji wan metnên devkî. Ev jî bûye sebeb û bi salan di warê folklorê de zêde berhevkarî nehatiye kirin û pirtûk pir hindik hatine çapkirin. Nizanim ji ber çi ye, lê kurdan bêhtir bala xwe daye rêzimanê, rêziman bi cihekî de naçe, lê folklor diçe, jiyana kurdan diguhere, êdî wekî berê rîtuel nemane, şevbihêrk û ode tune ne. Wextê pîrek, kalek dimire, hezar tişt bi wan ra dimirin, loma divê pêşî wekî karekî ferz, em folklora xwe qeyd bikin, em karê berhevkariyê bikin.

Ji bo kurdan çima ewqas girîng e?

Folklor, hîmên netewetiyê, yekitiyê di xwe de dihewîne. Me ber bi hev ve tîne. Ji bo em di gelek warên din de bixebitin ji me re dibe pişt. Ma em ê çawa guh li tecrûbeya hezar salan a gelê xwe nekin? Ji vê mîrasê xurtir çi heye li ber kurdan? Kurd, neteweyeke folklorîk in, xwedî gelek rîtuelên cuda û zengîn in, zargotina wan okyanûsek e. Folklor, oksîjena kurdan e. Mesela biwêj, beşek ji zargotinê ne û yek ji nîşaneyên zengîniya zimanekî ne, li gorî em dibînin ji sed hezarî zêdetir biwêjên kurdî hene. Celadet Alî Bedirxan jî vê zengîniyê di Hawarê de dîyar dike û dibêje, li dinyayê tu ziman nikare qayişê bi folklora kurdan re bikişîne. Her giya li ser koka xwe şîn dibe, ji bo her tiştî zemînek lazim e. Em mecbûr in li ser çand û kelepor û folklora xwe, xwe ava bikin, xwe heyî bikin. Folklora me, pişta me ye. Mirov peyva xwe, gotina xwe nas bike, nikare wê derbas bike.

Kurd çima û çawa ji foklora xwe dûr dikevin?

Jiyana kurdan hat guhertin û diguhere, bi hezaran salan kurd li ser axa xwe bûn, bi zimanê xwe bûn. Gotina kurdan, urf û edetên kurdan her neqil dibûn û dihatin. Di dema osmaniyan de jî medreseyên kurdan hebûn, mîrîtî, eşîrtî hebûn, kurdan xwe parast. Lê îro ne wisa ye, bi milyonan kurd ji gund û warên xwe bûn, ji neçarî hatin ketin bajaran. Dewletê ew ji warên wan – kelehên wan– derxistin, esil dewletê li gundan bi kurdan nedikarî, gund, kelehên asê ên kurdan in, hîn jî gelek gund wisa ne. Ji bo kurdan bihelînin, qir bikin, ji bo kurdan ji jiyana wan dûr bixin ew anîn di bajaran re derxistin. Jiyana bajaran li wan û li zimanê wan nefesilî. Wekî gelek tiştên wan, zimanê wan jî li gundan ma. Kurd, li bajaran bi kurdî najîn. Kurdên li bajaran ji kurdîtiya xwe ketine. Kurdî îro li bajaran aşbetal e, naxebite, naafirîne. Em ji kîsê yên berî xwe dixwin. Civata kurdan feşkilî, ne urf û edet man, ne ode û şevbihêrk. Ev, rewşeke pir trajîk e.

Ev dûrketin di paşerojê de dê wêneyekî çawa derxe meydanê?

Hema em li roja me binêrin, paşeroj tê texmînkirin, nifşê nû, zimanê xwe, çanda xwe baş nizane. Ew dê û bavên ku em mezin kirin, wextê li me temaşe dikin, guhdarî dikin, dixwînin nema ji me fam dikin. Kurd e, hatiye ketiye bajaran, li bajarî jiyaneke bi kurdî tune ye. Kurd wextê ji zimanê xwe dûr dikevin, esil ji xwe dûr dikevin. Nema dizanin çawa tev bigerin, nema dizanin çi ji devê wan derdikeve. Xerîb in. Dar û devî û giya û xweza jî ji wan re xerîb e. Ziman bîr e, tu wê ji bîr bikî, tu ji bîra xwe dibî, ka dê yekî bîrko dê ji me re çi bibêje? Muzîk û edebiyat û hunera ku îro gelek jê ji vê bîra ko xweyî dibin, loma tim qels in, loma nikarin bandora xwe li ser gelî çêbikin. Tehmsarkî ne, ji cewherên xwe dûr in, bê ekl in, bê kok in.

Hûn bi salan e dersên zimanî didin, çîrokan dinivîsin, li ser folklorê dixebitin, niha jî karê weşangeriyê lê zêde bû, lê bişaftin jî dewam dike, kurd gelek jê bi kurdî naaxivin, lazim e mirov çi bike? Sîyaset çi dike? Me çi nekiriye?

Mirov divê ji tecrûbeyên xwe yên berê sûd wergire. Gelek xetayên me kurdan hene di warê zimanî de, yek jê divê em bizanin wextê boykot û kampanya û tiştên wekî wan derbas bûye. Hemû rêxistin û pêşeng û siyasetmedar û rayedarên kurdan lazim e xwe rexne bikin û xetayên xwe yên di warê zimanî de bibînin. Siyasetmedarek ku giringiya zimanî nezane, nikare siyasetê bike. Tu wekîlê gelê xwe bî, divê tu wekîlê zimanê gelê xwe bî jî. Mirov bi kesên din nikaribe jî bi xwe dikare. Gerek em ji xwe dest pê bikin.

Baş e, derfet e, lê bi tenê avakirina çend beşên kurdî û dersên bijarte, ev mesele hel nabe. Îro derfeta wê tune ye, zimanek nebe zimanê perwerdeyê, nebe zimanê bazarê bi kurtasî nebe zimanê jiyanê nikare bijî. Ziman organîzma ye ku însan pê axivîn heyî dibe. Heke tu dev jê berdî dê têk biçî. Li vir metirsiya esasî li bajaran e, zimanê bajaran tirkî ye. Berê kurdan jî li bajaran e. Hesab bikin li bajarekî wekî Amedê wextê li derve hûn dibînin kurdek bi zarokê xwe re bi kurdî diaxive kêfa we tê. A ev tiştekî sosret e!

Ziman, di ser siyasetê re ye, tişta ku kurdan hemû digihîne hev ew e. Lazim e hemû sazî û dezgeh û kesayet bên cem hev û li dora meseleya zimanî bibin yek. Li dinyayê em kurd tenê nehatine bişaftin, gelek neteweyên din jî hatine bişaftin, li dinyayê rê û rêbaz û bername bi çi awayî ne? Mirov li hemberî bişaftinê lazim e çawa û li gorî kîjan siyasetê tê bikoşe? Divê em li hev rûnin û bernameya xwe, plansaziya xwe amade bikin. Û helbet divê em zorê bidin qada siyasetê, çimkî di vî warî da gelek şaşiyên wan hene. Ziman, ne alaveke siyasî ye ku mirov wî ji bo berjewendiyên xwe bi kar bîne, ew şertê hebûna neteweyekê ye û divê hemû partî bi vê cidiyetê xwe bidin ber meseleyê. Plan, plansazî, polîtîka û bernameya me ya zimanî tune be, em ê têk biçin. Ev diyar e.

Sartre dibêje, mirov ne tenê ji tiştên kiriye, ji tiştên nekiriye jî berpirsiyar e. Eger em li gorî vê çarçoveyê li meseleyê binihêrin, em dê bibînin ku gelek tiştên me ji bo zimanê xwe nekirine hene. Yek jê em li meseleya zimanî hûr nebûne, xisûsî siyasetmedarên me, me qîmeta zimanî zêde fam nekiriye. Me di sazî û dezgehên xwe de zimanê xwe bi cih nekiriye. Me peyvên zimanê xwe berhev nekirine, me ferhengeke vî gelî amade nekiriye, me hişmendiya zimanî li nav gelî belav nekiriye..

Di vê meseleyê de em nikarin xwe bidin benda siyasetmedar û rayedaran. Ji ber ku jiyana wan bi piranî tirkî ye û di vê meseleyê de piştkul û xemsar in, ew nikarin pêşengiyê bikin. Mirov ku hişyar nebûbe, nikare însanan hişyar bike. Di vê meseleyê de kurdên xwenda, kurdên zana, kurdên xemxur, kurdên nivîskar û hunermed eger bigihîjin hev dikarin tiştekî bikin. Wekî din zor e.

Gerek em nebêjin, hezar salan e zimanê me heye, heta îro hatiye dê hertim jî hebe. Gund kelehên asê yên kurdan bûn, bajar jî ji wan ra bûn goristan. Kurd, li bajaran najîn. Çimkî li cihê ku zimanê te lê tune be, tu tune yî; tu tune dibî! Em hîn nemirine, lê em tên kuştin. Em li "kuştina" kurdî, yanî li kuştina "xwe" temaşe dikin. Lê haya gelek kurdan ji vê yekê tune ye.

BAHOZ BARAN kî ye?

Bahoz Baran: Bahoz Baran, di sala 1982'yan da li navçeya Amedê, li Licê ji dayik bûye. Li Zanîngeha Dîcleyê beşa perwerdeyê xelas kiriye û li Zanîngeha Artûklûyê di beşa kurdî de lîsansa xwe ya bilind temam kiriye. Edîtor û yek ji avakarên Weşanxaneya Wardozê ye. Berhemên wî: Rêzimana Kurmancî A baş Derb Ferhenga Bişaftinê Motik Rêzimana Kurmancî Qîza Bavê Xwe.

rupel 5++:Layout 1 10.01.2020 21:05 Page 1 (Black/Black plate)

Kenan Colemêrg

Veng-deng

Deng nasnameya zindeweran e. Xweza bi dengan afirî û helbet me baweriyên xwe, kesayetên xwe, çanda xwe, dîroka xwe û hestên xwe bi dengan ava kirin. Me bi dengan jiyan nas kir, hestên xwe anku tirs û kêfxweşî û hwd. me bi dengan zanî. Deng amûrek bû, amûrek veguhestinê û bibîrxistinê, helbet bo ew kesên ku xwezayeke giran dijîn benikek di navbeyna jiyan û mirinê de bû deng. Li vê derê navbeynek hewce ye, ji ber ku me qala jiyan (afirîn, bûn, jidayikbûn, xwebûn), mirin û zindeweriyê kir. Di nav zindeweran de tenê mirov e ku dizane jidayik dibe û dê bimire û ji ber hindê ye ev qas serêşî û mijûlahî... Mirov ji bo xwe di nav van gengeşeyan, gengeşeyên fikr, raman û jiyanê de, her xwestiye mijûlahiyekê ava bike, tiştekê veguhêze. Ev tişt bi nexşên keviran kiriye; weke nexşên Sat, Geverok, Deşta Xanê, Kelêtanê, bi abîdeyan, bi nîşaneyan kiriye û piştî demeke dirêj nivîs dahênaye. Her çi be xwestekek diyar heye; veguhastin!

Deng berze nabe

Haya mirovan jê heye ku li ser dinyayê her tiştek piştî demekê berze (wenda) dibe, nexş berze dibe, abîde tê hilweşandin, nîgare jê diçe lê belê deng berze nabe. Ev tiştek gelek girîng bû ji bo mirovahiyê. Dengê bayê qet naqede, dengê avê, dengê teyr û çûkan, diviya mirov weke wan kiribûna anku bizara wan, bizara xwezayê. Paşê jî ev tiştên cerebe kirî diviya veguhastina nifşên dîtir. Deng berze nedibû, bi her nifşeke din bi cerebe û serpêhatiyên nû deng zêdetir dibû û her vediguhazî.

Xwezaya dengan

Min divêt ji vir pê ve hinekî din taybet biaxivim ku baştir bikaribim veguhazim, ne bi dengî lê belê bi nîşaneyên dengî an ku nivîskî. Xwezaya ku ez jê hatim, xwezayek dengan e, ez ji vê xwezayê bûm; ez ji dengên bayê darên çiyayên asê bûm, ez ji dengê rûbarên har bûm û yên wekî min, zindewerên din jî her wisa. Deng ji xwezayê bûn, xweza ji dengan bû, çawa ku gerdûn pêk hat, em jî ji xîz û toza stêrkan bûn û ji vî tiştî re gotin jiyan; xweza jî ji dengan pêk hat û ji tewawiya wan re gotin xweza. Min(weke mirovekî) ev tişt (xweza-deng) bihîst û ez têgihîşt im, min bihîst û min qal kir, min bihîst û min hîs kir, min hîs kir û min veguhast... Pîr û kalên min her wiha kirin\kirîne. Bizar-e-yên xwe, serpêhatiyên xwe, kêfxweşî, eşq û lehengî, binketin û serkeftinên xwe bi zareyî anku bi dengî gotine bi xwezaya xwe gotine; bi gotina dengan bûne dengbêje...

Xwe-za û xwe-bûn

Ev çiyayên asê bi hezar salan ev bêje û kîteyên dengî di paxila xwe de hewandine, weke xwezaya xwe û heta vê rojê hênandine. Xwe-za, xwe-bûn heman tişt e, ya\yê ku xwebixwe çê (baş) dibe û pêşve diçe û digihîje. Bi min li mirovan du xweza hene yan jî du xweza ji mirovan pêk tên, yek xwezaya bûn û jidayikbûnê ye, ya din jî xwezaya zanîn, parastin, cerebe û guheziyê ye. Em bi kurtasî ji vê re dibêjin "çand". Çand xwezaya duduyan a mirovan e ku wê ji keriyên pezan, ji reviyên hespan, ji geleyên xezalan, ji garanên çêlan, ji şêrgeleyan, ji rewdeyên gurgan, ji refên çûkan, ji komên mirovan cuda dike. Çanda min e ku min ji gundê jêrî û jorî cuda dike, çanda min e min ji xelkê hevraz û nişîvahiyê zengîn û rengîntir dike, çanda min e dîrok, kelepûr, kevneşopiyên min dihewîne û min heyî dike, ez lewma hêj dijîm, ez lewma hêj tenê bi çiyayên xwe ve parastina xwe dikim û hêza xwe jê digirim, pîr û kalên min wiha kirin, ev jiyan û çanda wan bû ku veguhastin, em niha bi wê çandê dijîn, debara xwe dikin, hemû hestên xwe yên jiyanê parve dikin, beşa jiyanê pêkre dikin.

Civakên kîrografîk

Di dîroka gelên dinyayê de demek çanda devkî heye, ev dema çanda devkî, piştî derbasî çanda nivîsê dibe zêdehiyên gelên dinyayê êdî çanda xwe ya devkî berze dikin. Ev gelek pirsgirêkên civakî digel xwe tîne. Weke ku mêjiyê mirovekê/î hebe lê belê pêjn û seh nebe; ne dest, ne çav, ne difin, ne ziman hebe. Êdî ji bo wan tiştek hêsantir hebû, dikaribûn mijaran bêbend ji bîran derbasî ser amûreke din bikin û êdî hêdî hêdî rist û hîmên çandeke bêhempa (çanda devkî) ji bîr kirin, tiştek hêsantir peyda bû. Civakên kîrografîk ava bûn. Êdî hestên takekesî ketin şûna hestên civakî. Weke mînak; roman di wêjeya îngîlîzan de weke nûbûnekê ava bû. Lê belê nûbûnek çawa û li gorî kê ev nûbûn? "Roman" di îngilîziya ewil de (anku pêşiya dagirkirina normanan, dema anglosaksonan jî) weke zimanê bindestan dihat hesibandin, bindestan hestên xwe bi vî awayê dikariyan belav bikin û bi vê cureyê wêjeyek ava bû. Îngilîzan bi zimanekî nû ve (bişaftina zimanê normanan(fransiyan)) wêjeyek hilberandin. Ev tiştek hêsan nebû, niha jî ji 3000 zimanan tenê wêjeya 78 zimanan heye, helbet îngilîz jî di nav vê rêjeyê de ne, kurd jî… Îngilîzan bi çanda devkî nema ku ji bo zarokên xwe bi wê agahdar bikin, ji wan re qala dîrok, mirov û jiyanê bikin lê belê ev li cem kurdan hêj hebû.

Nîsko çawa bû Tilîko?

Belê, li cem kurdan hêj bi çanda nivîskî çanda devkî jî hêj weke roja ewilî didomiya, li cem îngilîzan jî çanda nivîskî ji roja ewilî bêhtir pêşve çûbû. Lê belê piştî çi? Piştî zimanê xwe ji bîr kirin, çand û lehengiyên xwe... Tenê û tenê cerebe û hestên takekesî hatin veguhastin, çi bêr û nimûneyên civakê neman heta ku di serê sedsala 19'an de hatin li Kurdistanê berhevkarî kirin; berhevkariya çanda devkî ya kurdan. Bi taybetî çîrokên zarokan berhev kirin û birin welatê xwe, ji bo perwerdeya zarokên xwe da ku qala jiyan, mirov û hestan bikin û bi hêsanî bi wan bidin fêmkirin. Yek ji van çîrokan jî "Nîsko" bû. Çîroka Nîsko bi sedan sal in li herêma Botan û Behdînanê weke çîrokek zarokên di navbera 0-6 salî tê vegotin û li gorî vekolînên me, ev çîrok ji bilî kevnahiya xwe bi kêm deformebûna xwe jî tê zanîn anku li gorî herêmên cuda bûyer û rêçûna çîrokê pir kêm guheriye. Bifikirin ew qas kêm guheriye ku "Tom Thumb"a îngilîzan dema bi wergera hinek hevalan (paşê ji me kêm nebin) bû "Tilîko" jî pir kêm guherîbû. Bi kurtasî wiha bibêjim; çîroka kurdan a bi navê "Nîsko" ji hêla îngilîzan ve ji bo dibistana zarokan tê berhevkirin û navê Nîsko dibe "Tom Thumb". Piştî 150 salan em kurd diçin çîroka pêşiyên xwe ji îngilîzan weke çîroka wan werdigerînin kurdî û navê "çîroka îngilîzan" dikin "Tilîko"! Li cem wan tiştek nemabû bidin gelê xwe, bidin zarokên xwe. Li me xêr bû, me çîroka xwe ya bi navê "Nîsko" kire "Tilîko"!

Rih, mirov û bêjîtî ye

Layê wan, weke dengbêjiya me çandek hebû, navê wê çandê "Courtly Love" bû. Ev kevneşopî piştî çanda nivîskî hilweşiya û di şûna wê de tiştek nû, tiştek takekesî ava bû; roman û nivîs... Hesta civakî çû, hestên kesî hatin. Em kêfxweş in ku hêj li cem me moçikên me yên "hesta civakî" didin cema ne, berbelav nebûne, ew moçik; dengbêj in. Ev moçik goyende ne û barê hemû jiyanê, di dil û mejiyên xwe de dihewînin lêbelê dermanan jî bi qirika xwe didin. Ferdinand de Saussure dibêje " nivîs, her çend kêrhatî be ewqas jî kêm û metirsîdar e". Nivîs dubare nake, nivîs tenê bi nîşaneyên dengan xwe bi cih dike, ew sar e. Deng, qirik, mêjî, dil, hilm germ in, dema ev pêkre bin an jî ev bi ahengekê pêkre ji bo têgihandinekê bizivin û tevbigerin, wê çaxê dijîn, em li wê çaxê dijîn. Pavlus di "Name ji bo romayiyan"ê de dibêje "nivîs dikuje, rih giyanê dide" li vir rih dev e, li vir rih mirov e, bêjîtî ye.

Hore, More, Siyaçeman

Li gorî baweriya civata yarsanan (kakayî), "xwedê mirov ji êgir çêkir lêbelê rih xwe di laşeagirî de nedigirt, paşê peywir da Benyamên, gotê "qet nesekine û deng bide (mûzîkê bike), Bênyamên bê sekin deng da, wê demê rih xwe di nav laşî de girt". Baweriya kurdan a di êzidayetiyê de jî, di demên pîroz de 7 sama (miqam) hene tên lêxistin, dibêjin ku ev miqam ji bo dinyayê bûne nimûne (Hore, More, Siyaçeman) ku gelên dinyayê mûzik naskirine. Her çawa be, tiştek heye ku di ev civaka me ya kevn de "deng" û "bêjîtî" cihek girîng û mezin girtine. Helbet ev çawa girîng, mezin û taybet e, bi mînakan, di nivîsên paşiyê de hindî ji dest, mêjî û dilê min bê dê bidim nasîn. Bi dengê "Nêrîbel"* li deştên biyaniya me, çiyayên xwe digerim, silava xatirê ji we dixwazim û bi ziman û dengê Nêrîbelî dibêjim;

"Ez naxwim giyayên zûran û avên şoran e
Serikê danim ka û giyayan e
Vexwim avên çeman e"

***Nêrîbel: Lehengê destaneke devera Colemêrgê ye.**

Hest û Helbest

Mehbûbe Seadetmend

Helbest di nav kurdên Xorasanê de

Helbest di nav kurdên Xorasanê de pêşîneyeke xwe ya berbiçav heye. Ev pêşîne bi sedema dîroka helbesta îraniyan û zewqa kurdan ku piştî koçberiya wan bi Xorasanê jî hatiye domandin, ji hezar salan zêdetir e.

Dibe ku ev mijar ji ser sêxiştiyên ku çend hezar sal in li wêjeya kurdan bi taybetî kurdên koçber li Xorasanê, were famkirin. Lê ji ber ku wêjeya xelkê kurd pirtir bi awayê devkî û sîng bi sîng gihîştiye nifşên paşê û hem ji ber tunebûna rênivîseke yekgirtî heta salên dawîn, hejmareke zêde ji wan helbest û stranan di dema borî de jî wenda bûne yan jî navên helbestvanên wan nenas mane.

Her wiha bextewariyek e ku parek ji helbestên folklorên kurdî ku di dîrokê de ji bîr nebûne li qalibên wek 'sêxiştî' û 'lo' gihîştine destê nifşên îro û bi hewla lêkolerên îroyîn hatine berhevkirin û weşandin. Ji ber ku belge û destxetên pêwîst hindik in, diyar nîne ku yekem helbestvana/ê kurd li Xorasanê kî bûye. Lê çawa ku ji sened û belgeyan diyar e, helbestvanên wek Îbnê Qerib li sedeya 12 û Ceferqulî li sedeya 13 ji helbestvanên herî kevnar ên kurd li Xorasanê ne ku her du li Xorasanê ji dayîk bûne û li Xorasanê jî wefat kirine.

Ji ber ku li Xorasanê ji berî niha xelkên kurd û tirk û faris li gel hev jiyane, her du helbestvanên klasîk ên kurd ji bilî strandina helbestên xwe bi zimanê zikmakî (kurdî), bi çend zimanên din wek tirkî , erebî û farisî jî strîne.

Heta îro dîwana Ceferqulî û parek ji helbestên Îbnê Qerîb hatiye weşandin û gihîştiye ber destê xwendevanên xwe. Ji bo Ceferquliya Zengilî xoşewîstiyek taybetî heye her wisa ji ber ku helbesta wî dikare bi mûsîqî bê gotin û hem ji ber şohreta wî li dutarvaniyê, bala berdengan zêdetir kişandiye ser xwe.

Teqrîben nîv sedeya dawîn, bi diyarbûna helbestvanên xwendekar û xweş zewq, helbesta kurdî li Xorasanê canekî teze girt. Ev helbestvan ku giştî berî strandina bi zimanê kurdî, bi zimanê farisî jî henekoyiya xwe hêçandine. Bi xwendin û xebat û behremendî ji wêjeya farisî, bi dirustî helbestê nas dikin, meraq bi parastina zimanê zikmakî bala wan kişandiye ser strandina bi zimanê kurdî. Helbestvanên hevçaxên kurd, li Xorasanê ji ber xwendina helbestên giştî derên cîhanê û bandorbûna ji wan, bişe kirine.

Taybetmendiyên bihêz ji zimanê farisî wek wezn û erûz û beşavend û wêneçêkirinê li helbestên kurdî jî bi kar bînin. Helbesta îroyîn a kurdî li Xorasanê li qalibên kilasîk wek xezel, mesnewî, qit'e , sêxiştî, çarok, robayî , dumalik û li qalibên nû wek lo, nîmayî û helbesta spî dihê strandin.

Li salên dawîn helbestvanên kurdên Xorasanê bişe kirine ku qaliba dumalik ku yek ji qalibên berbiçav e, wek derfetek ji bo strandinê bi qalibên helbesta kurdî zêde bikin û wê bikemilînin.

rupel 6+++:Layout 1 10.01.2020 21:36 Page 1 (Black/Black plate)

Plansaziya pêşerojê amade kirin

HDK'ê civîna xwe ya Lijneya Giştî ya HDK'ê ya 10'emîn li dar xist. Di civînê de hat gotin ku pergala kapîtalîzmê di krîzeke kûr de ye û li gelek welatan gel jî dijî kapîtalîzmê rabûne

Navenda Nûçeyan

Kongreya Demokratîk a Gelan (HDK) di sala 2011'an wek sîwaneke têkoşîna hevpar a partî û derdorên muxalîf hat damezirandin. HDK'ê xwe wek alternatîfa rast ku pêwîstiya gelên Tirkiyeyê pê heye bi nav kir. HDK ya ku bi bu îdiaya avakirina xeta têkoşîna siyasî xwe saz kir, hêzên Tirkiyeyê yên demokratîk, sosyalîst, femînîst û hwd. di nav xwe de dihewîne.

10'emîn Lijneya Giştî ya HDK'ê bi dirûşma "Kapitalîzm, baviksalarî û faşîzm dikuje; ji bo jiyanê li ber xwe bide, xwe birêxistin bike û ava bike" di hefteya borî de pêk hat. Her wiha Meclisa Jinan a HDK'ê jî 10'emîn konferansa xwe bi dirûşma "Bi serhildanên Jinan ên li Şîlî, Sudan, Îran, Rojava ber bi jiyanek nû" pêk anîn. Di konferans û kongreya ku hatî lidarxistin de plansaziya pêşerojê hat amadekirin. Di kongreyê de Îdîl Ugurlu û Sedat Şenoglu wekî berdevkên HDK'ê hatin hilbijartin. Di lijneya giştî ya HDK'ê de rêzikname hat guhertin. Di rêziknameyê de hejmara endamên meclîsa giştî ji 121 kesan daxistin 101 kesan. Encamnameya kongreyê jî hat aşkerakirin.

'Li dijî şer serî rakirin'

HDK'ê bal kişand ser pergala kapîtalîzmê û diyar kir ku pergala kapîtalîzmê li tevahiya cîhanê di nav krîzê de ye û bi mezinbûna vê krîzê re şer û pevçûn her ku diçe li herêmê zêde dibin. HDK'ê di encamnameya xwe de mijar nirxad û got: "Pêşbirka di navbera emperyalîstan de bi ser gelan de tê xwarê. Herî dawî kuştina fermandarê leşkerî yê Îranê Qasim Silêmanî ya ji aliyê DYA'yê ve herêma me ber bi şerekî nû ve biriye. Li Tirkiyeyê jî rejîma qesrê, li pey xeyalên xwe yên zindîkirina Osmaniyan bi komên cîhadîst ên li gel xwe re êrîşîşporeşa Rojava û destkeftiyên wê kirin. Her wiha ev rejîm niha jî ji bo ku ji çavkaniyên Lîbyayê sûdê werbigire, hewl dide leşkerên xwe bişîne Lîbyayê. Li cîhanê ji ber şerê heyî gelên ku bêzar bûne êdî li Iraq, Lubnan, Fransa û heta Îranê dest bi serhildanan kirin."

Rewşa koçberan demek dirêj e di rojeva Tirkiyeyê de ye û ev mijar jî di encamnameya HDK'ê de wiha hat nirxandin: "Îro erdnîgarî bi guhertinên demografîk ên mezin re rû bi rû ye. Sedema vê krîza avhewayê serwerên cîhanê ne. Ev kesên şerxwaz bi şerê ku derdixin, bi talana ku li ser çavkaniyên xwezayê pêk tînin di heman demê de dibin sedema koçberiyeke mezin. Kesên tên koçberkirin mecbûr dimînin ku bi kedeke erzan bixebitin, keda wan tê çewisandin û dibin hedefa êrîşên nijadperestan."

'Vîna gel hat xespkirin'

Mijare din ku di kongreyê de hat nîqaşkirin tayînkirina qeyûman bû. Vê mijarê di encamnameyê de jî wiha cih girt: "Rejîma qesrê li Tirkiyeyê ji ber pirsgirêkên siyasî, îktîsadî û civakî ku sedema wan ew bi xwe ye, êdî nema dikare xwe li ser lingan bigire. Bloka AKP û MHP'ê ji bo krîza heyî derbas bikin di bin navê bekayê de zêdetir serî li tundiyê didin û dixwazin ku muxalefeta demokratîk bifetisînin. Li Kurdistanê şaredarên ku bi dengê gel hatin hilbijartin di bin navê qirkirina siyasî de ji peywirê hatin girtin û îradeya gel hat xespkirin û qeyûm tayînî vê îradeyê hat kirin. Lê pêvajo nîşanî me dide ku dê ev tayînkirina qeyûman tenê bi şaredariyên HDP'ê sînordar nemîne û dê di fersenda ewil de şaredariyên Enqere, Stenbol û her wekî din jî bên desteserkirin."

'Tinazên xwe bi gel dikin'

Her wiha di encamnameyê de qala şîdeta li hemberî jinê û binpêkirina mafê kedkaran û karkeran jî hat kirin û wiha hat bilêvkirin: "Bloka AKP -MHP'ê tenê nûnerên komeke biçûk a kesên bijarte yên olîgarşîk in û ji bo dewlemendkirina koma xwe ya biçûk têdikoşin. Lê ji bo kedkaran jî wekî ku tinazên xwe bi wan bikin gotin 'me ji bo we jestek kiriye' û muçeyê asgarî wekî 2 hezar û 324 TL diyar kirin. Îktîdara ku kesên ji ber krîza aborî întîhar dikin, ji nedîtî ve tê daneyên di warê aboriyê de jî wekî rewşa baş nîşan didin û derbas dibin."

Jinan encamname aşkera kir

Meclîsa Jinan a HDK'ê bi xebatên xwe ji jinên Tirkiyeyê re bû mînak. Bi tecrûbeyên xwe yên bi salan xebatên xwe geştir kirin. Herî dawiyê jinan 10'emîn konferansa xwe ya HDK'ê pêk anî. Di konferansê de xebatên ku hatin kirin hatin nirxandin û ji bo pêşerojê jî plansazî hatin amadekirin. Nîqaşên ku di konferansê de hatin kirin wekî encamname bi raya giştî re hatin parvekirin. Çend biryarên ku di encamnameyê de cih girtin wiha ne: "Meclîsên Jinan a HDK'ê dê di sala 2020'an de li dijî kuştina jinan, xespkirina deskeftiyên jinan, êrîşên zayendî û hişmendiya dewletê, têkoşîna xwe bidomîne. Ji bo astengiyên li pêş debara jinê heyî bên rakirin, ji bo heqê wekhev û karê wekhev, bê qebûlkirin, ji bo mafê rêxistina xebatê bê parastin û ewlehiya wê bê kirin, ji bo kreşan bikin xizmeta civakê, ji bo keda malê bê dîtin, xebatên bi rêxistin divê bên kirin.Konferansa me, li aliyekî polîtîka û xebatên dema pêş diyar dike û bi rêxistin dike, li aliyê din jî kêmasî û nebesiyên dema borî bibîr dixe û ji bo dubare nebin xwe li gor wê ji bo pêşerojê amade dike."

3 hezar û 286 kes wenda ne

Piştî êrîşên li hemberî Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê gelek kiryarên dijmirovî pêk hatin. Bi sedan kes jiyana xwe ji dest dan, birîndar bûn û bi hezaran kes koçber bûn. Her wiha 3 hezar û 286 kes jî winda ne. Ev kes ji Kobanê, Efrîn û Cizîrê hatine revandin. DAIŞ'ê 544 kes, komên Îtîlafa Watanî ya Sûriyeyê 2 hezar û 368 kes û dezgehên ewlekariyê yên rejîma Sûriyeyê 374 kes revandin. 8 kes jî li herêmên di bin kontrola HSD'ê de winda bûne.

Fermandarê Giştî yê Hêzên Sûriyeya Demokratîk (HSD) Mazlûm Ebdî, diyar kir ku li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê 3 hezar û 286 kes heya niha ji aliyê çetayên cuda ve hatine revandin û aqûbeta wan nayê zanîn. Fermandar Ebdî, destnîşan kir ku ji bo aqûbeta windayan bê zanîn, der barê aşkerakirina sûcan de dê komîsyoneke lêpirsînê bê avabikin û got: "Ev komîsyon dê faîlên van bûyeran derbixin holê û bi raya giştî re parve bikin."

QAMIŞLO

Dev ji şandina leşkeran berdin

Nîqaşên li ser şandina leşkeran a Libyayê bi her awayî didomin. Nûnerê Taybet ê Neteweyên Yekbûyî (NY) yê Lîbyayê Hasan Salame, banga "Ji Lîbyayê dûr bisekinin" li welatên biyanî kir. Salame, piştî civîna Konseya Ewlehiya NY'ê daxuyanî da û bang li welatên ku piştgiriya her du aliyan dikin jî kir û ev tişt got: "Destên xwe ji Lîbyayê vekişînin, welat jixwe ji mudalxeyên derve gelek êşê dikişîne." Salame, têkildarî êrîşa ku li Trablûsê li dijî dibistanekê pêk hatibû û 30 kesan jiyana xwe ji dest dabû jî axivî û hevalbendên Artêşa Neteweyî ya Lîbyayê ya di bin kontrola General Xelîfe Hafter de berpirsyar dît. Salame, herî dawî jî da zanîn ku tiştên gelên Lîbyayê dijîn li ber çavan nayê girtin û ev tişt got: "Li Lîbyayê têra xwe çek hene, pêwîstiya wan bi çekan tune ye. ***BRUKSEL***

Destkeftiyên kurdan di metirsiyê de ne

Bi kedeke mezin û bedelen giran li Rojava pergaleke nû ya jiyanê hat avakirin. Di qada siyasî, aborî, tenduristî, leşkerî, perwerde û civakî de pergaleke nû û pêşketinên mezin ên ku li tevahiya cîhanê bibe mînak hat afirandin. Ne tenê li Rojava li her çar parçeyên din jî destkeftiyên gelek bi nirx derketin holê. Lê niha di siyaseta ku li her çar parçeyên Kurdistanê de ji hêla metingeran ve tê meşandin hemû destkeftiyên kurdan di bin metirsiyê de ne.

Ji bo parastina destkeftiyan ne tenê li Rojava li parçeyên din jî her tim banga yekitiyê tê kirin. Endamê Buroya Têkiliyan a Partiya Yekitiya Demokratîk (PYD) a herêma Dêrikê Nayif Hesen di nirxandinên xwe de bal kişand ser parastina destkeftiyan û got: "Ji bo parastinê pêwistî bi yekitiyê heye."

Partiyên siyasî yên ji bo berjewendiyên xwe yên kesane û partiya xwe dixebitin bû mijara nirxandinên Hesen û wiha bilêv kir: "Avakirina yekitiyê erka hemû beşên civakê, aliyên siyasî, oldar, rewşenbîr û rûspiyên eşîran e."

Gavên erênî bavêjin

Hesen diyar kir ku li gor hewcedariyên demê, partiyên siyasî gavên têr û berbiçav neavêtine û wiha anî ziman: "Hin alî û partiyên siyasî gavên têr û berbiçav neavêtine. Di dema li hemberî kurdan komkujiyek pêk tê hincetên ne rast nîşan didin. Divê kurd helwesta xwe bikin yek û banga Mezlûm Ebdî ya yekitiya kurdî bi cih bînin û gavên erênî ji bo yekrêziya kurdî bavêjin."

Yekitiya axa xwe ava bikin

Hesen, di axaftina xwe de li ser hewcedariya yekitiyê rawestiya û got: "Hewldanên avakirina yekitiya kurdî divê di çarçoveya Rojava de sînordar nemîne. Divê partiyên kurdistanî li her çar parçeyan yekitiya axa ava bikin. Ji ber ku destkeftiyên gelê kurd li rojava û başûr di metirsiyê de ne, hin partî erka ji wan tê xwestin bi cih naynin, ji ber ku bi dewletên mêtigerên Kurdistanê ve girêdayî ne. Ya girîng di vê pêvajoyê de yekitiya gel û parastina destkeftiyan e ku bi xwîna şehîdan hatine qezenckirin." ***QAMIŞLO***

rupel 7+:Layout 1 10.01.2020 21:38 Page 1 (Black/Black plate)

Felemez Ulug

Têkiliya berjewendiyan

Serokomarê tirk Recep Tayîp Erdogan û Serokdewletê Rûsyayê Vladîmîr Pûtîn di 8'ê çileyê de li bajarê Stanbolê ji bo vekirina boriya gazê a Turk Akimi li hev civiyan. Ev hevdîtina ku ji bo herdu welatan pir girîng e di bin siya nakokî û pevçûnên di navbera Amerîka û Îranê de pêk hat.

Armanca Rûsyayê ji despêkê ve ew e ku ji bo bikaribe gazê derbasî Ewropayê bike ji derveyî Ûkraynayê rêyê alternatîf peyda dike. Her wiha Tirkiye jî, ji bo derbaskirina gazê rêyek hêja bû. Bi vê ve girêdayî Tirkiyeyê dixwest ji bo xwe jî gazê bigire. Lewma ev xeta ku di navbera Rûsya û Tirkiyeyê de hat vekirin, ji bo Rûsyayê pir girîng bû û li gor vê girîngiyê jî bi awayekî hesas û baldar rêveberiya Kremlînê ev pêvajo dan meşandin.

Bê guman ev pêvajoya ku di 10'ê cotmeha 2016'an de bi peymana herdu dewletan hat îmzekirin, des pê kir piştî çar salan bi dawî bû. Ev pêvajoya çar salên ku projeya avakirina xetê berdewam dikir, di heman demê de pêvajoya herî baş a têkiliyên di navbera Tirkiye û Rûsyayê de bû. Ev yek jî nirxandinên Rûsyayê yên ji bo vê pêvajoyê têk neçe, di hin mijaran de li ruxmî ku wek Tirkiyê nafikire jî bêdengmayîna wê piştrast dike. Bê guman rêveberiya Tirkiyeyê jî di ferqa vê de ye ku ew bi saya van peymanên di navbera herdu dewletan de hatine îmzekirin, dikarin li herêmê piştgiriya Rûsyayê werbigirin. Ev jî bi xwe re tekiliyeke stratejîk ti carî dernaxe holê.

Di van salên dawîn de ji bo asta têkiliyên di navbera herdu dewletan de bi pêş ketiye, veguherin asteke stratejîk, li Sûriye û Lîbyayê hevkariyê dikin. Lê rastiya Rûsya û ya Tirkiyê ji hev pir dûr in. Ne gengaz e ku ev herdu dewlet ji derveyî mijarên aborî, çandî û bazirganiyê ve bikaribin di asta dîplomasî û leşkerî de peymanên stratejîk bi pêş bixin. Her çiqas di vê mijarê de daxwaza dewleta tirk hebe jî, ji ber rewşa wê ya navneteweyî ew jî nikare zêde pêş ve biçe. Rêveberiya Rûsyayê jî di ferqa hêza Tirkiyeyê ya lawaz û bêkontrol de ye ku bi pêş dikeve. Lewma armanca wan ew e ku di vê pêvajoyê de bi saya Tirkiyeyê wê bikaribin çiqas xwe li herêmê bi cih bikin. Di rewşa heyî mirov dikare bêje di vê mijarê de herdu dewlet jî dixwazin destê hev xurt dikin.

Di halê heyî de bi vekirina boriya gazê a Turk Akimi ve Rûsya gihîşt armanca xwe. Têkiliyên bi saya vê peymanê ve pêşketin di hin mijarêndin de jî herdu dewlet nêzî hev kirin. Lê rewşa li Sûriyeyê tê jiyîn û peşketinên li Libyayê bi pêş dikevin li ber çavan e. Her çiqas ev herdu dewlet xwe nêzî hev bidin nîşandan jî berjewendî û kevneşopiya wan nahêle ku ew di heman eniyê de bimînin.

Pûtîn beriya ku biçe Stenbolê serdana Şamê kir. Ji ser Sûriyeyê re derbasî Stenbolê bû. Bê guman di dîplomasiya navneteweyî de wateya vê heye. Ez bawer dikim rayedarên tirk jî encam ji vê hemleya Pûtîn derxistine.

Wek me li jor jî got, li herêmê nakokiyên Amerîka û Îranê gavek din pêş de çûn û kûrtir bûn. Lê dema mirov rewşa herêmê digire ber çav û bi wê ve van pêşketinên tên jiyîn dinirxîne, wek tê gotin di navbera van herdu dewletan de şerekî germ wê di vê pêvajoyê de neyê jiyîn. Dîsa mîna berê dê hev tehdît bikin li hin deveran êrîşî baregeh ango leşkerên hev bikin lê dê ji vê pêşdetir neçin. Di herêmê de rewşa herdu dewletan dest nade ku şerekî germ bi pêş bikeve.

Ev yek jî bi kêrî Rûsyayê tê. Rûsya li herêmê bêdeng û bi zanebûn tevdigere û dizane pêdivî û lawaziyên dewletên herêmê çi ne. Li gor wê nêzî wan dibe û li gor berjwendiyên xwe dixwaze wan bikar bîne. Bi vekirina vê boriya gazê jî êdî Tirkiye jî di vî warî de bi Rûsyayê ve tê girêdan. Li gel dewletên din Rûsya bi siyaseta xwe ya nerm û ji guhertinan re vekirî li herêmê digihîje armanca xwe.

Di şerê serweriyê de merhaleyeke nû

Çîroka kurdan a bi Qasim Silêmanî re di sala 1979'an de bi serhildana Mahabadê re dest pê dike. Ji wê salê vir ve, di hemû komkujiyên li hemberî kurdan de ew heye

Mehmet Şahîn



Piştî ku serweriya DAIŞ'ê ya li ser xakê bi dawî bû, hêzên li pey serweriyê ne dest bi şerê hev kirin. Kuştina bi sûîqestê ya yek ji rêveberên herî girîng ê leşkerî û siyasî yê Îranê Qasim Silêmanî û Fermandarê Haşdî El Şabî Mehdî El Muhendîsî li Bexdayê nîşan dide ku dê Şerê Cîhanê yê Sêyem ê li Rojhilata Navîn girantir û berfirehtir bibe.

Ayetulah Alî Hamaney ji hêla hişmendî û bîrdoziyê ve ji bo şoreşa îslamî ya Îranê çiqasî girîng be, Silêmanî jî ji hêla leşkerî, ewlehî û parastina rejîma îslamî ve ewqasî girîng e. Lewre, Silêmanî ne fermanderekî ji rêzê ye, rasterast bi Alî Hamaney ve girêdayî ye. Ew û Elî Hamaney hevûdu temam dikin. Ji ber ku her tim bê fikar û bi awayekî canfeda paêazvaniya rejîma îslamî kiriye û ji ber lêhengî û fedekariya wî li Îranê jê re digotin şehîdê zindî.

Fermandarê xeyalet

Di çarcoveya plansaziya parastina rejîmê de şerên Îranê yên asîmetrîk û yên bi destê wekîlan li derveyê Îranê dihatin meşandin hemû di bin fermandarî û bi plansaziyên Silêmanî de pêk dihatin. Lewre, pênaseyên 'fermandarê xeyalet, şûrê Îranê yê Rojhilata Navîn û hwd.' belesebeb lê nehatine kirin û hedefgirtina wî jî ne teseduf e. Fermandarê gelek hêzên nepenî û paramîletêr ên pîvanenas û xwînrij bû. Berpirs û koordînatorê hemû kiryarên derhiqûqî yên dewleta Îranê yê Rojhilata Navîn û rêveberê stratejiya şerê asîmetrîk ê li Iraq, Yemen, Lubnan, Afganistan û Filistînê bû.

Dijminê sondxwarî ye

Çîroka kurdan a bi Silêmanî re di sala 1979'an de bi serhildana Mahabatê dest pê dike. Di 22 saliya xwe de bi dijberî û zordariya xwe ya li dijî serhildêrên kurd dikeve çav û pêlik bi pêlik payebilindbûna wî dest pê dike. Ji wî salî vir ve ye di hemû komkujî û hovîtiyên li dijî kurdan de li ber perdê nebe jî di pişt perdê de ew hebûye.

Yek ji kiryarên wî yên li dijî kurdan ên herî girîng jî di referandûma Başûr a 2017'an de pêk hat. Kerkûk jî di nav de di windakirina ji sedî 40 erdnîgariya başûrê Kurdistanê de rola sereke ya Silêmanî bû. Ji milekî ve berê çeteyên xwe yên hêzên Heşdî Şebî da wargehên Kurdistanê, ji milê din ve bi gefxwarin û şantajan tifaqa PDK û YNK'ê tune kir û nakokiyên di navbera wan de heyî kûr kir û mixabin wekî her carê bêtifaqiya civaka kurd careke din ji serkeftina xwe re kir bingeh. Lewre ji bo kurdan Silêmanî dijminê sondxwarî yê kurd û Kurdistanê ye.

Dewleta Îranê û dewleta tirk bi sûîqastên derhiqûqî gelek serok û rêberên kurd û muxalîfên xwe qetil kirin. Îsraîl, Rûsya û Amerîka demeke dirêj e di qada navneteweyî de serkêşiya vê rêbaza kirêt dikirin. Lê ya girîng van dewletan heta niha ev kiryarên xwe yên kirêt tu carî qebûl nedikirin û nedigirtin ser xwe.

Şerê Cîhanê yê Sêyemîn

Belê Şerê Cîhanê yê Sêyemîn roj bi roj kûrtir dibe û erdnîgariya Kurdistanê jî di navenda vî şerî de cih digire. Xeterî û metirsî herî zêde ji bo civaka kurd hene. Lewre herî zêde pêdiviya civaka kurd bi baldariyê heye. Pêdivî bi girtina bergiriyên civakî yên pêwîst heye. Rewşên kaotîk bi qasî ku di xwe de gelek metirsiyan dihewînin ewqasî jî fersendan jî di xwe de dihewînin. Kî bi hêz be û bi disîplîneke rêxistinî tevbigere ji pêvajoyên kaotîk serkeftî derdikeve. Ev heqîqeteke diyalektîkê ye.

Ev heqîqet bi awayekî zelal ji me re wiha dibêje; erdnîgariya Kurdistanê careke din bê hemdê kurdan dibe qada şerê hêzên hegemonan. Heke civaka kurd dawî li parçebûna xwe neyne û tifaqa xwe ya neteweyî pêk neyne dê careke din bi berdêlên herî giran re rûbirû bimîne.Heke civaka kurd yekitiya xwe ya neteweyî pêk bîne û di nav tifaqa neteweyî de tevbigere dê karibe xwe û welatê xwe biparêze û destkeftiyên xwe zêde bike.

Bi mudaxeleya pergala kapitalîst 200 sal in li Rojhilata Navîn bûye gola xwînê. Diyar e ku heta dawî li mudaxeleya pergala kapîtalîst neyê dê herîkîna xwînê bi dawî nebe. Kurd bi tifaqa xwe ya neteweyî dikarin ji neteweya demokratîk re pêşengî bikin û dawî li hewldanên pergala kapîtalîst ên kirêt û xwînrij bînin.

Herêm bûye cihê sixuriya welatan

Ligel ku parlementoya başûrê Kurdistanê di sala 2003'yan de ji bo derxistina artêşa tirk a ji axa herêma Kurdistanê biryar girt jî, niha zêdetirî 20 baregehên leşkerî û sîxurî yên dewleta tirk li herêmê hene û heta niha ev biryar nehatiye bicihanîn.

Serokên fraksiyonên Komela Îslamî, Tevgera Goran û Yekgirtûya Îslamî yên li Parlamentoya Herêma Federal a Kurdistanê têkildarî mijarê gotin divê rêz ji axa welatên din re bê girtin.

Bombardûmana li ser herêmê û bicihkirina baragehên leşkerî yên li herêmê, ji hêla serokê Fraksiyona Komela Îslamî ya Kurdistanê Ebdulistar Mecîd ve hatin rexnekirin û wiha hat gotin: "Em li dijî hemû destdirêjiyên welatan ên li ser herêma Kurdistanê ne. Divê hikûmeta Iraqê û ya başûrê Kurdistanê hatina leşkerên derve û bombardûmana di nav axa welat de asteng bikin. Li gor peymanên navneteweyî, tu dewlet nikare di nav sînorên welatekî din de bombardûmanan bike yan jî mudexele bike. Heke hêzên welatên neyar jî bin divê rêz ji xaka welatê din re bigirin."

Serokê Fraksiyona Yekgirtûya Îslamî ya Kurdistanê Ebubekir Heledenî jî li ser mijara parlementoyê rawestiya û diyar kir ku Desteya Serokatiya Parlamentoyê ev mijar nekiriye bernameya xwe û paşguh kiriye.

Heledenî wiha dom kir: "Axa Iraq û herêma Kurdistanê ji aliyê hêzên mezin û welatên cîran ve her tim tê binpêkirin. Hine caran dest diavêjin nav karên navxweyî yên herêmê jî. Herêm bûye qada çûn û hatina dezgehên ajan û sixuriya welatan." Serokê Fraksiyona Tevgera Goran Elî Heme Salih jî anî ziman ku bi salan e dewleta tirk û welatên din axa herêma Kurdistanê bombebaran dikin, destwerdana van welatan ne qanûnî ye û wiha axivî: "Heta niha jî biryara parlementoyê ya ji bo derxistina hêz û welatan ji nav xaka herêma Kurdistanê nehatiye bicihanîn." ***SILÊMANÎ***

Pentagon ket lîsteya terorê

Piştî kuştina fermandarê Hêza Qudsê ya Parazvanên Şoreşê yên Îranê Qasim Silêmanî û fermandarê Heşdî Şebî Ebû Mehdî el Muhendîsî aloziya di navbera Îran û Amerîkayê de her ku diçe kûrtir dibe. Parlamentoya Îranê di civîna xwe ya hefteya borî de, Wezareta Parastinê ya Amerîkayê û hemû artêşa Amerîkayê xist nav lîsteya terorê. Her wiha di heman demê de jî Îranê li baragehên DYA'yê li Iraqê xist.

Li gor biryara parlamentoya Îranê, hemû endamên Pentagonê, rêxistinên girêdayî Pentagonê, fermandarên artêşa Amerîkayê û kesên fermana kuştina Qasim Silêmanî dane, li lîsteya terorê zêde kirin. Artêşa Muhafizên Şoreşê yên Îranê, bi fuzeyên balîstîk li barageha DYA'yê ya li Ayn El-Esad a Iraqê xist. Muhafizên Şoreşê daxuyanî da û got: "Çavkaniyên êrîşên bi dijminî yên li dijî Îranê dê bibin hedef. Ger ku DYA bersiv bide, dê êrîşa me hêj dijwartir bibe." Rayedarên DYA'yê jî daxuyaniyek da diyar kir ku ti zirar nedîtine. ***BEXDA***

Jon Tirkan nav guherandin



Sedat Ulugana

Jon Tirk her çiqas kiryarên Ebdulhemîd ji holê rakin jî zêde dest nadin Alayên Hemîdiyê, tenê di sala 1910'an de navên wan vediguherînin û dixin "Alayên Eşîretan" an jî "Alayên Eşîretan ên Siwarî" û ji artêşa navendî serleşkeran dixin nav wan

Dema ku pirsgirêk û şerên alayan ên navxweyî diqedin, alay vê carê bi gelemperî berê xwe didin ermen û girseyên wek wan ên mesîhî. Kiryarên alayan ên bi vî rengî bi tundî heya şoreşa Jon Tirkan berdewam dikin. Heya dema Jon Tirkan (1908), pirsgirêkên herêmê her diçe zêde dibin. Serekên eşîran ên ku di bin serweriya Siltan Ebdulhemîd de bûn, peyderpey dest didan ser gund, mal û milkên ermen, suryan, keldan, nestûr û êzidiyan. Di van rojan de bi taybetî ermen êdî berê xwe didin Rûsya û Amerîkayê. Çûyîna wan a li van welatan karê eşîran hîn hêsantir dikin. Dema ku Jon Tirk dibin desthilatdar, hewl didin ku alayan ji holê rakin, ermen jî di van rojan de bi du xwestekan derdikevin pêşiya Jon Tirkan: radestkirina mal û milkên wan ên desteserkirî û tesfîyekirina alayan.

Tehdê li gel kirin

Di wîlayeta Wanê de (di sêgoşeya Panos, Erdîş û Elcewazê de) Huseyn Paşayê Heyderî, (di sêgoşeya Erdîş, Bêgirî û Giyadînê de) Elî Axa û Qulîxan Axayê Ademî, (di sêgoşeya Milazgir, Kop û Panosê de) Rizayê Xalit; di wîlayeta Erziromê de (di sêgoşeya Dutax, Panos û Mûşê de) Ebdulmecîd Begê Sîpkî, (di sêgoşeya Bazîd, Îdir û Giyadînê de) Biroyê Heskê Têlî ew kes bûn ku herî zêde tehdê li ermenan dikirin. Li ser dozvekirina dewletê, piraniya van serekên eşîran direvin Îranê. Lê paşê dewlet wan efû dike û ew jî dîsa vedigerin herêmên xwe[1]. Mirov dikare bibêje ku Jon Tirk her çiqas piraniya kiryarên Ebdulhemîd ji holê rakin jî zêde dest nadin Alayên Hemîdiyê, tenê di sala 1910'an de navên wan vediguherînin û dixin "Alayên Eşîretan" an jî "Alayên Eşîretan ên Siwarî" û ji artêşa navendî serleşkeran dixin nav wan, bi vî şiklî jî kontrola dewletê ya li ser alayan bêhtir qewî dikin. Çend meh şûnde jî dewlet, di bin navê "Artêşa Herêma Bakur" û "Artêşa Herêma Başûr" de heman alayan dabeşî du beşan dike û serleşkeriya yekîneyên bakur didin Kor Huseyn Paşayê Heyderî û serleşkeriya yekîneyên başûr jî didin serekên eşîra miliyan. Bi vê dabeşkirinê mebesta dewletê ew bû ku li bakur li hemberî ûris û li başûr jî li hemberî îngilîzan bendeke ewlehiyê ava bike.

Nerazîbûna Alayên Eşîran

Alay hê di serî de ji kiryarên Jon Tirkan qet razî nabin. Mînak, dengbêjê êwrê Mistefayê Xelê Heyran di kilama xwe ya bi navê "Şerê Selanîk"ê de dibêje ku qasidê windakirina Selanîkê "Bînbaşî û Yuzbaşiyên Mekteplî" ne ku qismek ji alayên eşîran jî di bin emrê wan de bûn[2]. Aliyê Jon Tirk ên sekuler her dem ji bo Alayên Eşîran sedema nerazîbûna li hemberî dewletê bû. Piştî Şerê Balkanan, kurd êdî dikevin nav tevgereke cuda. Di van salan de piraniya kurdan di bin banê "Komeleya Alîkarî û Pêşketinê ya Kurd" (KAPK)[3] de dicivin. Li wîlayeta Diyarbekirê çi dijberên malbata Pîrînçîzadeyan[4] hebûn hemû derbasî aliyê KAPK'ê dibin. Paşê alayên Îbrahîm Paşayê Milî yê ku ji Jon Tirkan derbe xwaribûn jî dîsa derbasî aliyê KAPK'ê dibin. Her wiha li wîlayeta Bedlîsê jî Alayên Eşîran ên ku di bin bandora şêxên xalidî de bûn, bi awayekî veşarî êmla (meyl) xwe didin ser KAPK'ê. Çendekî şûnde ji malbata Bedirxaniyan Huseyn û Kamil ên ku ew demek bû li Sêrt û Wanê rêvebir bûn, firarî rojhilatê Kurdistanê dikin. Li wir Simko û Seyîd Taha dibînin. Ebdurezaq Bedirxan ê ku ew çendek bû li Moskowê penaberê polîtîk bû, di bin mahiyeta çarê ûris de derbasî rojhilatê Kurdistanê dibe[5]. Li vir nameyan ji serekên Alayên Eşîran re dişînin; ji van serekan yek jî Kor Huseyn Paşayê Heyderî ye. Lê ew ji Kamil Bedirxan re dide xeberan û dibêje: "Ez namûsa misilmanan pêşkêşî Ûris nakim. Ji ber ku ez ne 'bîj' im." Lê dema çend sal şûn de diçe rojavayê Kurdistanê û li wir çav bi Kamiran Bedirxan dikeve, vê carê jî li ser çavên xwe dixe û dibêje: "Min wê demê xeta kir". Şairê kurd Cegerxwîn şahidê vê lehzê ye[6].

Serhildana li Bedlîsê

Armanca KAPK'ê û Bedirxaniyan li Kurdistanê pêkanîna serhildaneke gelemperî ye, lêbelê ji bilî Bedlîsê serhildan pêk nayê. Di sala 1914'an de bi pêşengiya Mela Selîmê Hîzanî, Seyîd Elî û Şêx Şabedîn serhildanek pêk tê. Di destpêka serhildanê de gotineke Mele Selîm başkêş e, dibêje: "Ey milet! Hûn ji bo Bedlîsê waliyek dixwazin? Ha ji we re Hecî Mûsa Begê Motkî (Xweytî) …"[7] Her çiqas alayên di bin emrê Hecî Mûsa de bi awayê fermî di nav pergala "Alayên Eşîran" de nebû jî, bi şiklekî nîvfermî ji aliyê dewleta Osmanî ve dihat nasîn. Em dibînin ku Hecî Mûsa Beg bi awayekî têkilî vê serhildanê bûye. Alayên Eşîran ên din zêde tevlî serhildanê nabin, lê hema qet nebe alîkariya dewletê nakin ji bilî Silêmanê Mamê. Silêmanê Mamê, serekekî alayên eşîra Ademan a herêma Erdîşê bû. Dema serhildan tê perçiqandin, Şêx Şabedîn ji bo derbasbûna rojhilatê Kurdistana direve Geliyê Zîlanê. Li vir dewlet bi alikariya Silêmanê Mamê[8], Şêx Şabedîn li gundê bi navê Sogitliyê dîl digire, dibe Bedlîsê û li wir darda dike.

Çavkanî:

1 - Klein, Hamidiye Alayları-Împaratorlugun Sinir Boylari ve Kurt Aşîretlerî, r.276-278
2 - (…) şer giran e, şerê Dordincî Ordiyê şerê kurdan e, kurd ecemî ye nezan e nizan e zimanê çar mektebliyan e, mektebliya dînê xwe firotin bi peran e Eskerê te eskerê Jon Tirkan e, eskerê min eskerê emeliyan e emelî li dinyayê bêxweyî bêxwedan e Muhefeziya wan ji Anadoliyê bêguman e, îmdada wan jor Xweda ye, jêr pêşiya wan sêsid jinên lazan e (…)"
3 - Bi tirkî jê re digotin: "Kurd Teavun ve Terakkî Cemiyeti".
4 - Vê malbata ku aliyê dê ve Zîya Gokalpê tirkperest jî endamê wê bû, di wîlayetê de Îttihat ve Terakki Cemiyeti (Komeleya Yekîtî û Pêşketinê) temsîl dikir.
5 - Wê demê sînorê Rûsyayê heya Tebrêz û Xoyê daliqiye. Yanî beşeke rojhilatê Kurdistanê di nav sîronên împaratoriya Rûsyayê de ne. Bedirxanî jî direvin diçin Xoy û Tebrêzê.
6 - Cegerxwîn, Hayat Hikayem, werger: Gazi Fincan, Evrensel Basim-Yayim, Istanbul, 2003, r.54
7 - Nevzat Bingol, Bitlis Îsyani ve Şeyh Selim, Do Yayinlari, Istanbul, 2013, r.9
8 - Dengbêj Ebdurehmanê Panosê: "…lêbelê ji bona rizaya Xwedê bê Silêmanê Mamê koka te biqele Ma tu nizanî seyîd e bê ayîk in te çawa daye pêşiya sê tabûr esker Digerînî lê belê ji bona Xwedê li her çar çiqê Geliyê Zîlan.

Sal bi sal xwezî bi par

Şêrgele

Dema em biçûk bûn
xeyalên me mezin bûn,
Em mezin bûn, xeyalên me jî
biçûk bûn...

Salek din jî ji emrê me çû, ango me pişta salek din jî şikand. Her sala ku derbas dibe em jî pîr dibin. Yanî cîhana ku em tê de ne jî pîr dibe. Ev pîrbûn kevinbûnê jî bi xwe re tîne. Li aliyekî dema tu dinihêrî, di vê dema teknolojiyê de her tişt kêlî bi kêlî nû dibe. Lê li aliyê din di jiyana mirovan de dubarebûn heye. Teknolojiyê ji aliyekî ve jiyana mirovan hêsan kir, ji aliyekî ve jî mirov ji hev dûr xistin. Îro çi devera tu bixwazî tu dikarî xwe bigihîniyê. Yanî li ser înternetê her tişt di destê te de ye. Lê xuyaye ku ev yek jî mirovan têr nake. Lewma gelek kes ji jiyana xwe nerazî ne.

Ji ber ku di her axaftinê de behsa cejnên berê, salên berê û demê berê tê kirin. Eger jiyan hesan be çima mirov li demên berê digere? Îro di destê her mirovî/ê de telefon heye. Telefon jî bê înternet nema bi kêr tên. Li gorî zanyaran jî wê di çend salên pêşiya me de mirov bê înternet nema karibe derkeve derve. Lê ez dixwazim li vê derê behsa demên berê bikim. Berê telefonên malan jî tinebûn, lê jiyan hebû. Di vê jiyanê de parvekirin zêde bûn. Eger em rojekê telefonan deynin aliyekî jiyan dimeşe gelo?

Ev yek zehmet e. Ji ber ku her mirovek di nav rojekê de nêzî sed carî li telefona xwe dinihêre û pê dadikeve. Ev yek jî ji jiyana mirovan diçe. Pergaleke bi vî rengî afirandine ku her kes kirine koleyê xwe. Çerxek çêkirine divê tu jî di nav vê çerxê de bî. Kesê ku li derve bimîne dibe biyanî. Îro li ser cîhana înternetê civakek hatiye avakirin. Tê ferzkirin ku her kes têkeve nav vê civaka sexte. Yanî civaka ku tenê nivîsandin hebe. Hîskirin, nêzîkbûn û hevaltiya nêz tê de tune ye. Li aliyekî bi milyonan kes li ser înternetê hevalê te ye, lê li aliyê din kes li dora te tune ye. Di cîhana îro de her yek ji me bûye koleyê pergala kapîtalîzmê. Pergala kapîtalîst biryarê dide tu kîjan kincî li xwe bikî û çawa tevbigerî. Bi vê pergalê re tu dibe parçeyek ji kapîtalîzmê. Armanca vê pergalê ew e ku mirovan ji hev dûr bixe û jiyanek egoîst ava bike. Îro rewşa li cîhanê ji nêz ve dişopînin. Mesela berê gund hebûn û jiyana bajariyan hebû. Lê îro her der bûye jiyana bajariyan. Li gundan jiyaneke komunal û berhemdar hebû. Pergala kapîtalîst ev jiyan daqurtand. Hema hema li ber tunebûnê ye. Mirov dixwazin ji gundan û ji jiyana wê birevin. Bi vê yekê re xwe davêjin paşila kapîtalîzmê.

Difikirin ku çiqasî ji xwe dûr bikevin wê ewqasî bi pêş bikevin. Encama wê jî xuyaye. Eger tu ji gundê xwe, ji cih û warê xwe derkevî, tu yê ji nasname û çanda xwe dûr bikevî. Wê demê tu yê bibî kesayetek bê esil! Jiyan bi xwebûnê xweş e. Tu çiqasî yê/a xwe be, tu yê ewqasî hebî.

rupel 9+++:Layout 1 10.01.2020 21:18 Page 1 (Black/Black plate)

Ma xwu rê ciya bin!

Çekuya "zaza" bi hawayê nuştekî reya verîne hetê seyahê tirkî Ewlîya Çelebî ra ameya şixulnayiş. Zazacîtî zî reya verîne hetê Ebubekir Pamukçuyî ra dest pê kerd. Eno merdim eslê xwu de tirkperest o

Roşan Lezgîn

Ena çekuya "zaza" ke semedê ma yena vatiş, bi hawayê nuştekî reya verîne hetê seyahê tirkî Ewlîya Çelebî (1611-1678) ra ameya şixulnayiş. Neke sey name yan çekuyêka xwusere, nameyê **kurdan** het sey îzafe Seyahetname de nuşta. Wexto ke behsê Çewlîgî keno, vano ***"Ekrâd-ı Zaza"*** û ***"aşiret-i Zaza"***. Yanî, vano "kurdê zaza" û "eşîra zaza". Beno ke Ewlîya Çelebî ena çeku metnanê erebkî ra girewta. Çimkî çend metnanê ereban de çekuya *"Zûzan", "Zewazan"* û *"Zûzan el-Ekrad"* viyarena. Ewlîya Çelebî manaya *"kurdê zozana"* û "eşîra zozana" de şixulnaya. Wina aseno ke çekuya "zaza (zozan)" eslê xwu de nameyêko topografîk o. Labelê Ewlîya Çelebî ra pey lîteraturê Usmanîyan de semedê ma kirdan/kirmancan/dimilîyan ameya şixulnayiş. Tirkan ra zî kewta fekê ma. Êdî gama ke ma bi tirkî xwu danê şinasnayiş, ma vanê "Biz Zazayız."

Bi her hawayî îsbat beno ke nameyê ma yê etnîkî "kird" o. Eno name manaya "kurd" de ya. Bi eynî telafuz, çekuya "kirmanc" zî muadilê çekuya "kurmanc"î ya. Çekuya "kurmanc/kirmanc" miyanê miletê kurdî de semedê tebeqeyê dewijan yena vatiş. Coka raşt nîyo ke ma kirdkî ra vajin kirmanckî. Ez bi xwu nêvana.

'Maz red nêkerda'

Ma ageyrin nameyê "zaza" ser. Nika ma zanê ke bi tesîrê tirkan eno nameyo topografîk teşmîlê ma biyo. Êdî ma zî qebûl kerdo. Ma lehçeya xwu ra vanê "zazakî" zî. Mi gore bikarardişê enê nameyî de tu zerarêk çin o, xwura ez tim şixulnena. Yanî ma çekuya "zaza/zazakî" red nêkerda. Labelê enê dahîris serranê peyînan de seba ke tayê kesî vanê "zazayî kurd nîyê" û "zazacîtî" kenê, coka biya problem!

Yew şiîra ey…

Zazacîtî reya verîne hetê Ebubekir Pamukçuyî (1946-1991) ra Swêd de, serra 1985 de bi vetişê kovara ***Ayre*** dest pê kerd. Eno merdim eslê xwu de tirkperest o, şiîranê tirkperestan nusneno. Mesela, yew şiîra ey wina ya:

"BEN KİMİM?
Ben Oğuz'um, ben Oruc'um
Mertlerin beyi, Osman'ım ben
Çaldıran'da, Ridaniye'de,
Mekke'de
Müslümanlar'ın beyi Yavuz'um ben
At üstünde Mustafa Kemal'im ben
Adımız Türk,
Dilimiz Türkçe,
Türk'üm, Türk'üm ben."

Lîderê zazacîyan nuştoxê enê şiîrî yo. Demeyêk malimî keno, dima Îstanbul de Muzeya Tewfîq Fîkretî de şixulîyeno. Çi semed ra biyo, bellî nîyo, la 1983 de şino Swêd. Uca vano *"Artık karar vermiştim. Ben bir Zazayım."* Û dest bi zazacîtî keno. Dima Koyo Berz, Mihem Himbêlij û Zülfü Selcan zî danê ey dima. Çiyo balkêş, enê her çar merdimî zî Malmîsanijî dir têkilîye de bî, piya kovaran de nuştêne. Beno rika ey ra winî kerd! Welhasil, mesela biye derge. Nika zaf kesî semedê zazakî vanê "Zaza dili" û semedê xwu zî bi tirkî vanê "Zazalar Kürt değil!" Heta partî bîle ronaya. Madem partîya xwu zî ronaya, ma xwu rê ciya bibin!


Ebubekir Pamukçu

'Zazayî hurr kurd ê'

Herçiqas tayê ferqanê mabeynê kurmancî û zazakî de mubalexa bikerê û tayê mulahezeyanê oryantalîstan sey delîl nîşan bidê zî, eslê xwu de tu binge yan delîlêko sehîh yê tarîxî, sosyalî, kulturî, ziwanî û etnîkî çin o ke zazayî kurd nêbê. Zazayî hurr kurd ê. Coka zaf akerde yo ke "zazacîtî" tenya yew tercîh o! Eynî seke Ebubekir Pamukçu vano *"Êdî mi qerarê xwu dabi. Ez yew zaza ya."* Yanî qerarê xwu dayo, ti se kenê bike, vanê ma kurd nîyê. Axir wazenê bi teşwîqê dewlete bo, wazenê sedemanê bînan ra bo, kam ke vano "ez kurd nîya" xwu rê wina tercîh keno. Madem ke sey tercîh qerarê xwu dayo û kurdîtî ra ciya benê, ma mîrasê xwu zî pare bikin!

'Nameyê eşîra kurdan o'

Ma nameyan ra dest pê bikin. Nameyê "kird" û "kirmanc" xwura kurdî yê. Çekuya "dimilî" zî tarîx de îstbatkerde yo ke nameyê yew eşîra kurdan o. Labelê ma fek nameyê "zaza" û "zazakî" ra fek veranêdanê, ma zî semedê xwu şixulnenê. Coka ma enê nameyî zî pare kenê: "zazakî" û "kurdîya zazakî" yê ma, "Zaza Dili" yê înan.

'Mohrê kurdîtî esto'

Serra 1985 ra ver çi eserê edebîyatê ma yê nuştekî û vatişkî estê, pêro aîdê ma yê. Mesela, zazayê ke Peter Lerchî fekê înan ra metnê zazakî nuştê, vanê"… ma pêrû canmirdê ***Kirdan*** î." Nameyê kitabê Ehmedê Xasî "Mewlidê **Kirdî**" yo. Usman Efendîyê Babijî mewlidê xwu dayo Faîz Beg Bedirxanî, dima Celadet Bedirxanî çap kerdo. Rojnameyê Roja Newe hetê kurpewer Doxan Şêxhesenanî ra vejîyayo. Nînan hemîne ser o mohrê kurdîtî esto!


Ehmedê Xasî

'Heme mîrasê ma yê'

Metnê ke kovar û rojnameyanê sey *Ozgurluk Yolu, Roja Welat, Devrimci Demokrat Gençlik, Medya Guneşi, Tîrêj, Dengê Komkar, Armanc, Berbang, Hêvî û Berhem* de weşanîyayê heme mîrasê ma yê. Her çiqas Zulfu Selcan dima milîyetê xwu ra îstîfa bikero û bibo zazacî zî, nuşteyê eyê kovara Hêvî de kurdane yê. Çimkî nameyê nuşteyê ey *"Folklorê Kurdî ebe zarava dimilkî"* yo. Eno zî mohrê kurdîtî yo.

'Milkê zazayanê kurdan ê'

Tarîxê zazacîyan 1985 ra dest pê keno. Coka enê tarîxî ra nat çi nusîyayo, ma do biewnîn alfabe û nasnameyê înan ra.

Eserê ke bi alfabeya kurdan nusîyayê û xwu sey kurd name kenê, otomatîkmen milkê ma zazayanê kurdan ê, aîdê ma yê. Tiya ra pey zî çi eserî bêrê meydan, ancî peymê ma eno yo. Ma do biewnîn nasname û alfabe ra.

Çimkî alfabe û îmlayê ma yewbînan ra ciya yê. Şixulnayişê ziwanî zî ciya yo. Mesela, ma semedê "dergi" vanê "kovare", ê vanê "peseroke". Bi eno qeyde nika di ziwanî virazîyayê: zazakîya kurdî û Zaza Dili. Wa Zaza Diliyê xwu û peseroka xwu bigêrê, se kenê bikerê.

'Ma xwu ra nêhesibnenê'

Ma bi xwu esla wayirtîya "müstakil bir dil" û eseranê zazacîyan û lîderanê înanê ke vanê "Türküm, Türküm ben" nêkenê, ma xwu ra nêhesibnenê. Wa zazacî zî esla eserê ke bi kurdîya zazakî ameyê meydan rê wayir nêvejîyê. Wa nuşteyanê xwu de nêvajê *"Zaza dilinde ilk kitap Ahmet-i Hasi tarafından yazılmıştır."* Çimkî o kitab kurdî yo. Zazacî wa vajê *"Zazaki Dili önderimiz Ebubekir Pamukçu tarafından İsveç'te Piya dergisi ile başlar."* Zazakî yê ma ya, Zaza Dili yê înan. Wa ma ra ciya bê.



Hesenê çavşîn

Berê li girtîgehê di nav hevalan de pergala nobetê hebû. Şevê hevalek dibû nobedar. Rojekê hevalê nobedar ê ku dora wî ye ne xuya bû. Ji hev pirsîn û li lîsteya nobedariyê nihêrîn û dîtin ku dora nobetê ya hevalê Hesen e. Ji hevalekî re gotin ku nû hatiye gotin, biçe Hesen şiyar bike. Heval çû û dîsa vegeriya û got du Hesen hene ez gazî kîjan Hesenî bikim.

Jê re gotin; gazî Hesenê çavşîn bike. Çû ku gazî wî bike. Dîsa vegeriya û got lê razane ez ê çawa bizanibim kîjan çavşîn e. Hevalan bi acizî jê re got, biçe çavê wan veke û li wan binihêre, kîjan çavşîn be ew e. Feqîrê hevalê nû çû ber serê Hesenekî ji wan û hewl da ku çavên wî vebike, Hesen ji nişkave veceniqî û got tu çi dikî heval.

Hevalê çavşîn jixwe ji bêxewî û ji qehra çavên wî êdî sor bûbûn. Hevalê nû nema dizanî çi bike, jê re got li qisûrê nenihêre hevalê delal min got qey tu Hesenê çavşîn î. Hevalê nû vegeriya û ji wan re got heyra hinekên din bişînin pey Hesenê çavşîn min yek ji xew rakir ew jî Hesenê çavsor derket.

Dûr bi nûr

Yek bi nav salan de çûbû û êdî her roj pitepita dê û bavê wî bû ji bo ku bizewice. Sibe nîvro û êvarê mijara sereke bûbû zewaca wî. Carekê ev mesele bi hevalekî xwe re parve kir. Hevalê wî got binihêre kuro wekî min li xwe nekî. Heke tu zewicî bi keçeke cîranê xwe re bizewice.

Tu neçî kesekî xerîb nexwazî. Heke ya tu bixwazî ji taxa te be û cîrana te be hewceyî telefonê nake, hûn dikarin ji şaneşînê jî bi hev re biaxivin.

Lê heke dûr be dê mala te bi telefonan xera bike û tu nema bi fatoreyên telefonê re digihîjî. Wekî din jî heke cîran be wê dê û bavê we jî hevdu nas bikin. Di navbera wan de problem zêde dernakevin.

Heke we li hev nekir jî û xwedê neke we hev berda, dîsa wê zarokê te li taxê bin û tu dikarî bi hesanî her roj wan bibînî. Îcar min jî xweliya heft gundan li serê xwe kir û min cîrana xwe anî. Êdî ez nema di ber mêvandariya mala bavê wê de digihêm. Bav diçe dê tê, bira diçe xuşk tê. Êdî li me bûye hesret ku rojekê em taştê, firavîn an jî şîva xwe bi tenê bixwin. Îcar nebî nebî hûn jî bi vê şîretê bikin, çiqasî dûr be ewqasî bi nûr e.

Ronahiya Rojê

Berfîn Dîcle

Neyarên veşarî

Ez heyran, hûn çi dixwazin ji min? Qesem dikim bi navê xwedê yek armanceke min a nivîsê heye ew jî; bes pê dilê xwe aş bikim û bêhna xwe derxînim...

Ma qey hema kî a dilê xwe; bi du sê rêzikên kurmanciya zelal û bi çend peyvên ku ji ber xwe ve li hev tên, li ser medyaya civakî nivîsandin, divê hema bibe nivîskar?

Her çiqas min gotibe: Ez ne yeka wisa bi pîr pergal im. Hema çi çax ji dilê min bê ez wê çaxê dinivîsim û pêre pêre li ser tora civakî diweşînim lê hê jî ti feyde nekiriye.

Ji wê roja erêkirinê de ye, ne nivîsek ji dilê min tê ne jî tiştên bi henek tên bîra min.

We, malê li min wêran kir. Destê xwe didim ber çena xwe, de bifikire ku tu nafikirî. Hingî min da ber hev û xwebixwe nîqaşan kir, ez westiyam. Bêhna min teng bû, firk avêt çema sitûyê min û niha nikarim li rast û çepê xwe bifetilim. Û vê mîrata karê malê, wisa li ber dilê min şîrîn bûye wisa şîrîn bûye heta hûn bêjin. Destê min ji karê malê vala nabe ku rakim pênûsê û a dilê xwe verêjim! Ev yek. A din jî; ji bo li ser mijarek xweş û bi qerf (komîk) binivîsim hingî hûr û kûr difikirim, tiştên ne tişt tên bîra min. Niha di nav şik û gumanan de noq bûme û mame!

Mînak cîrana min a jêr; tevî ku qet kek û pastayan naxwe jî her roj pasta çêdike, teyfikê bi serî dike û tîne dide min.Ez ê çaydankê deynim ber xwe û heta heblûrka dawîn jî bixwim.

Niha difikirim; heke ne ji bo bixwim û pê jê şîşmantir bibim be, ew ê çima pastayên ku jê nexwe çêke û bîne bide min? Bi rastî ji xwe yeka qelew im lê heye ku bi saya pastayên wê, jê qelewtir bibim û êdî tu cil li min nebin û dilê wê di min de rihet be jî…

Cîrana min a jor, a ku hemû xalî û tejikên malê bi ser serê min de dadiweşandin, mala xwe bar kir û çû. Xaniyê xwe jî firotiye malbatek bi gilûr. Ji bo bi ser min de qerebalix bikin û ez pê aciz bibim.

Nebî tu çi yeka dexes bûyî, nermijokê. Ne tu û mêrê xwe heta serê sibê diketin qirika hev û serûguh ji min dibirin. Hetanî ez nehatima neketima nav we, we gewriyê li hev diqetand. De here ku tu naçî. Xwedê bikim hûn goştê canê hev bixwin!

Jixwe cîrana min a li hember? Xwedê nede guran. Her ku mêrê wê bûye rêveberê saziyekê û bi şofêr û erebê diçe tê û çima carcaran ew jî lê siwar dibe, êdî bi çavê siltanan li xwe dinihêre. Di van rojên dawîn de; ne qet pirsa min dike ne jî keysê dide min ku ez pirsa wê bikim. Çiqas em di nav derî de rastî hev bên, ew ê ji nav derî bikişe hundir û bêje ziring û derî li rûyê min bigire. Rebenêêê, ji xwe ne tu bûna yî kesî ew nedikir, evdalê. Simbêlên wî mişkê ku xwe avêtibû mala me jî ji simbêlên mêrê te yê xirexavî, gurtir û dirêjtir bûn pepûkê!

Na heyran na! Vana ne derûcîran in, hebe nebe neyar in neyar. Lê mixabin; min heta niha bi wan nizanibiye.

Xwezî; ên neyar, ne tenê der û cîran bûna. Hevalên min ên tora cîvakî jî xêrnexwaz in! Çavên wan bar neda ku ez royê hema du sê rêzikan xêz bikim û dilê xwe pê egle bikim. Bi baweriya min, wan zanibû; ez çawa ji bo weşanê xwe bidim ber nivîsê, ew ê hibir li pênûsa min biçike û lênûska min vala bimîne.

Na na qet dilê xwe xweş nekin û kêfa xwe li min neynin, ez ê ji ser eksa der û cîranan û dost û hevalên xwe binivîsim.

De ji kerema xwe re, heger hûn ji dil bin û qenciya min bixwazin, vê nivîsa min, li rûpela serî û li bin serenavê rojnameyê biweşînin ku ez pê qerezan bidime wan!

rupel 11++:Layout 1 10.01.2020 21:12 Page 1 (Black/Black plate)



Hejmara 4'emîn a kovara Folklora Me derket

Navenda Nûçeyan

Kovara Folklora Me ku ji aliyê Weqfa Mezopotamyayê ve tê weşandin, bi mijar û hejmarên nû weşangeriya xwe berdewam dike. Hejmara 4'emîn a kovarê derket û xwîner dikarin li pirtûkxaneyan peyda bikin. Kovar bi mijarên cur bi cur derketiye û gelek mijar li rûpelên xwe xemilandî ye.

Di nivîsa edîtoriya kovarê de tê gotin ku li gel derxistina kovarê, tiştê din ê ku pê şanaz û serbilind dibin, eleqeya gel a ji bo kovara wan e. Nivîs bi van gotinan didome: "Hûn hem bi nivîsên xwe hem jî bi pêşniyar û rexneyên xwe hêzê didin me. Mala we tevan ava be. Bi taybetî girtiyên zindanan, bi name û nivîsên xwe yên hêja, coş û kelecana me zêde dikin. Bi xêr di hejmarên bê de, dê nivîsên wan jî bên weşandin di kovara me da."

Bi domdarî jî nivîsa edîtoryayê wiha ye: "Folklora Me, hejmara çarem dîsa têr û tijî ye. Berhevkariyên ji beşên cuda yên folklorê û binbeşên wan, gotarên cur bi cur, xaçepirsa folklorê, ferhengoka peyvan û hevpeyvîn; me kovara xwe bi van xebatan dagirt. Helbet tiştekî ku kêfa we dê jê re bê heye di kovarê de, loma jî xwe nexesirînin; xwe û maliyên xwe bê 'Folklora Me' nehêlin."

Navnî ana dabînkirina pirtûkên kurdî: bijarefix

Qedrî Esen

Li bakurê Kurdistanê piştî Pirtûka Kurdî, bi navê Bijarefix pirtûkfiroşeke din a dijîtal vebû. Rêveberê Bijarefixê Daryo, diyar kir ku xwestine bibin nasîner û belavkarê pirtûkên baş ên bi qebare

Li bakurê Kurdistanê piştî Pirtûka Kurdî, bi navê Bijarefix pirtûkfiroşeke din a dîjîtal vebû. Rêveberê Bijarefixê Daryo, diyar kir ku xwestine bibin nasîner û belavkarê pirtûkên baş ên bi qebare.

Li Tirkiye û bakurê Kurdistanê, bi dehan weşanxaneyên ku pirtûkên kurdî çap dikin hene. Ev weşanxane pirtûkên ku çap dikin, bi rêya pirtûkfiroşan belav dikin û difiroşin. Ji ber pêşketina teknolojiyê, êdî pirtûkfiroşên dijîtal vedibin û li ser înternetê vî karî dikin. Li bakurê Kurdistanê cara yekem Pirtûka Kurdî di sala 2014'an de dest bi vî karî kir.

Piştî Pirtûka Kurdî, bi navê Bijarefix pirtûkfiroşeke din a dijîtal vebû. Bijarefixê roja destpêkê ya salê (2020) bi dirûşma "dabînkarê bijartiyên we" dest bi weşan û firotina pirtûkên kurdî ya li ser înternetê kir. Malper bi zimanê kurdî û tirkî xizmetê dike. Malper ji bilî pirtûkên ku difiroşe, her wiha gotarên bijartî jî diweşîne. Herkesê ku bikeve malperê, heke bixwaze dikare xwe bigihîne van gotaran û li ser malperê wan bixwîne.

Roja yekem a salê vebû

Rêveberê malpera Bijarefixê Darînê Daryo, têkildarî malperê ji rojnameya Xwebûnê re axivî û agahî dan. Daryo, diyar kir ku xwestine bibin nasîner û belavkarê pirtûkên baş ên bi qebare û wiha got: "Bi ya me li gelek pirtûkên ku mohra xwe li wêjeya kurdî xistine neheqî çêdibe û ev jî zirareke mezin dide nifşên nûhatî. Bo vê yekê me bi dirûşma "dabînkarê bijartiyên we" dest pê kir. Helbet li gor referans û xwendinên me ev bijarte dîyar bûne."



Daryo, da zanîn ku fikra vekirina Bijarefixê di sibata 2019'an de bi wan re çêbûye û ev tişt anî ziman: "Asoxî bi şêwirîna 40-50 kesan me biryar li ser navê Bijarefix da. Piştî ku kakilê malperê hinekî kemilî, me dest bi pratîka wê kir. Di 22'ê nîsanê 2019'an da fermîyeta me hat pejirandin. Piştî fermiyetê, di 7 mehan de karên teknîkî qediyan û malper di roja yekem a 2020'an de vebû."

Her bijartin heye

Di dirêjiya axaftina xwe de Daryo, li ser navê malperê û berhemên ku bifiroşin jî agahî dan û wiha domand: "Bijarte ango neqandî di qadên cihê yên jîyanê da xwe dide der. Pêşî mirov ji xwe re hevalan dibijêre. Paşê pîşeyekê, di her karî de hema bibêjê ev bijartin heye. Me jî li ser vê fikre, ji dewlemendiya kurdî sûd wergirt û navê Bijarefix pejirand. Ji bo destpêkê em ê pirtûkên kurdî û yên der barê kurdan de hatine nivîsîn bifiroşin. Lê bo dahatûyê helbet lîsteyeke me ya baş heye. Hinekî bi pêşîdîtîna xwe em dê wan jî bifiroşin."

Daryo, bal kişand ser eleqeya ji bo Bijarefixê û axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Eleqeyeke razber nîne. Lê li gorî daneyên li ber destên me rojê 250 - 300 kes li malpera me dinihêrin. Heta hinek sîparîş jî çêbûne; ji Cizîr, Enqere, Kanada hwd. Lê hîn firotina me kêm e. Lewra em nû ne."

Kesên ku bixwazin xwe bigihînin Bijarefixê û pirtûkan lê peyda bikin, dikarin li vê navnîşanê binihêrin: *https://www.bijarefix.com/*



Weswese 2

Şener Ozmen

Sê nifş û çend pisîk

Wêje pariyekî jî bîr e ma ne? Ya ku di ger û geşta me ya di rêk û xaçerêkên nivîsaran de, xwe bi lêrasthatiniyên bêhnçikîn şanî me dide, helbet dolaba me rast bigere, bi gotineke din, bextê me lêxe. Lêxe ku, bi wan lêrasthatiniyan, em bişên hiş û bîra xwe jî tevlî vegotina nivîskêr bikin û li wir jî bi cî bibin. Xwendin, di heman qatê de bicihûwarbûyînek e, em çendî li dijî dîwêr û stargehên nîgaşî derkevin jî, dawiya dawî, bi saya wê xwendinê, bêyî ku fama mirina xwe bikin, digihên qonaxine din. De bibêjim, di xwendinê de tu tişt dêris nabe, di henga xwendinê de nivîskêr pişkdarî li kel û cehda we neke jî –bêguman ev ne peywirek e– we awayekî ji awayan han dide, çi ka, çi dibe, ne wilo? Û gelek caran jî, em di nav wê geremola hişî de vedigevizin, çi ku em naxwazin bi nivîskêr re wilo zû bi zû li hev bikin. Gelo çîrokek, helbestek, romaneke kurdî heye wekî bêyî gelemşeyên zimên me xwendibe? Bêyî qal û şer qedandibe? Ma ne divêt xwîner jî parîyekî caris bin? Çirrek şekir bavêjin qehweya xwe ya tarî, *Têbînîyek*'e Înan Erogluyî bixwînin, dû re dest bavêjin *Pisîk Jî Xewnan Dibînin* a Şahînê Bekirê Soreklîyî, wexta we hebe, şeva xwe bi *Soneyên Sewdaser* a Kawa Nemirî bi dawî bînin. Min got, heke kêşe xwendin be, tu tişt deya naçe, neçûye jî!

Gava min çîroka pêşîn a nivîskarê ciwan Înan Erogluyî ya bi navê 'Pisîk'ê[1] xwend û têbiniyên xwe hema li valahiya binê rûpelan nivîsîn, çîroka *Pisîk Jî Xewnan Dibînin*[2] a Şahînê Bekirê Soreklî hat û ket bîra min, ku vê dawiyê, di *Soneyên Sewdaser*[3] a Kawa Nemirî de jî, ez rastî hêmaya pisîkan – û bêguman jinan– hatibûm. Jin di dilqê pisîkan de derdiketin pêşiya me, yan jî, pisîk di dilqê jinan de, çi bi musîbetên bi siyasetê ve têkildar, çi bi vecinoqiyên zayendî, hemnîgaş in, lewre em ji wan hez dikin û em wan vedukujin. Wexta ku pisîkên Înan Erogluyî, li bajarokê Bismilê belapêjgarî şêniyan dibe, pê re pê re Balafirgeha Diyarbekirê –û gelek deverên din– jî ji aliyê pisîkan ve tê dorpêçkirin, tekane tişta ku lehengê vê çîrokê dixwaze pêk bîne û bi vî awayî xwe bide bexişandin, rizgarkirina evîneke di dildemayî ya ku –li gorî çîrokê– dest û pê lê sar dibin çaxa hîn dibe wekî evîna wî, di heman qatê de ji hemzayendên xwe jî hez dike. Lêbelê ji ber çi pisîk û gemaroya pisîkan? *"Wê şevê gava min bi hişkî lê vegerand ku ez wê diterikînim û têkiliya xwe pê re qut dikim, bi hîseke mişt xapiyayî vegeriyam mala xwe. Vê hîsê kir ku piştî wê bi tu kesî re nikaribim bibim destgirtî."* (Têbîniyek, r. 16)

Lehengê Şahînê Bekirê Soreklî jî, gava pêrgî pisîka ku ji zû ve ye dêhn û bala wî li ser e dibe û pirsa *Sonya*yê jê dike û dibêje; *"Min her dixwest bêhtir der barê jiyana wê de bizanibim. Îroj ku ez çîrokan dinivîsim, hewceya min bi serpêhatiya wê heye. Bi taybetî dixwazim bizanibim, çima jineke weke wê, jineke xweşik û li gor civata xwe pêşketî, jineke xwîngerm, miroveke ku dikarîbû nizimtî û bilindiya xusetê kesan ji hev derxe, yeke ku xwe fêrî xwendinê kiribû û ji berhemên baş hez dikir, ket vî karî…"* (Pisîk Jî Xewnan Dibînin, Şahînê Bekirê Soreklî, r. 249), bîr û baweriyên seyr yên hezarsalane yên der barê nankoriya –bêbextiya– pisîkan de –aya ji ber çi û çi bawerî bi evîna wan nabe?– li darî çavan dibe. Lehengê Erogluyî, bi awayekî gazindokî bi dehan navên pisîkan rêz dike (r. 17), wek hawê ku ne jil be jî, xwestibe şêl û tevgera evînê (çawan bi tayekî xav tê xapandin?), di henga ku evîn ji hed û sedê xwe derbas dike de, têderêxe, belam, êdî bi destê neşûştî bi nav dikeve, pê ne gengaz tê wekî careke din li evîna xwe ya xapînok vegere. Axirî soxirî pisîk vedigerin û dîsan (bi newnewê) hezkiriyên xwe tînin ser tasê; *"Eve dibêje, gava navbiriyekê dide giriyê xwe. Ez dê xwe cardin bikim qurbana wê evetê."* (r. 18).

Vedigerim Şahînê Bekirê Soreklî, li çîroka wî ya bi navê Pisîk Jî Xewnan Dibînin, bi dû pêdagiriya lehengê çîrokê, pisîka me tîne dibêje; "Ma te hay jê niye ku yên ji nîjada me xwediyên zanistiyeke taybetî ne. Rojeke ji rojan em lawirên nirxbilind bûn. Wek mînak, di dem û dewrana firewnên Misra kevnar de, me cihekî bilind hebû di ola wan de, em lawirên pîroz bûn." (r. 246), Sonyaya bê ser û şûn çûyî ya ku di dilqê pisîkê de derketiye pêşiyê, dûvedirêj qala pisîkên welatên dûr û deraz dike, wekî çawan halxweş in, xweziya xwe bi wan û bi şêwejiyana wan tîne, pariyek jî bi kawikî. Bêguman 'îmaja neteweyî' di van herdu çîrokên ku di demên ji hevûdin gelek dûr û ciyawaz de (ku gelek qonax tê ve çûne) hatine nivîsandin, di ser nîgaşa pisîkan û pisîkbûyînê re, alegoriyeke dij-kolonyalîzmê jî ranavîşî me dike; digel ku kompleksa Odîpal zehf bi zelalî neyê fesilandin jî, li ser kar e. *"Herdu kesên gihiştibûn polîs bûn. Yekî ji wan nasnameya min xwest û pirsî, ka ez di dema berbangê de li baxçê çi dikim. Min jî, hema di cih de û bêyî çi tevdîr, gotê, ez li xewnên wenda digerim."'* (Pisîk Jî Xewnan Dibînin, r. 251). Helbet, di vê kurtenivîsarê de kêşeya sereke ne ku berawirdkirina çîrokên navend-pisîk in, ku wisa bûya, min dê ew berawirdî çîroka Haruki Murakamiyi ya bi navê *Town Of Cats'ê* (Bajarê Pisîkan, The New Yorker, 2011) bikirana ku lehengê vê çîrokê, awayekî ji awayan tê bajarekî ku pisîk lê dijîn, dixebitin û kar û barên xwe yên rojane bi rê ve dibin û ji ber ku dişên di tarî û zilûmatê de jî bibînin, pêdiviya wan bi tu teherî bi ronahiyê nabe û nebûye jî. Îro ro, axivandina lawiran –li vir pisîk in– di cîhana me ya ku wekî cîhaneke pişt-heqîqetê tê bilêvkirin de, vegotineke çîrokî ya bi vî rengî (nemaze di çîroka Înan Erogluyî de), ji bo zelalkirina heqîqetê û rozgara demê (bîbirina nasnavî û heqîqeta welêt), rê û dirbeke din nîşanî me dide. Ji bo watepêdayîna heqîqetê, wer xuyaye, demeke gelekî dirêj dê pêdiviya me bi arketîpan, bi efsaneyan, çîrok û fablên polîtîk hebe.

A sisêyan jî, *Pisîkê Li Asmalimescitê* ye ku helbestkar û wergêrê navdar Kawa Nemir, wî bi pencên wî yên ku ko bûne li ber şewq û şemala jinan, sêwirandiye. Çi ku hatiye gotin, candarekî guherbar î ku di navbera newtîneke sawdar û nirrenirreke arambexş de tevdigere, hem jinane ye hem jî şeytanî. Di kevala Manetyî ya bi navê Olympiayê de, ew li ser nivînan e, wilo piştxûz û bi mûyên xwe yên ziçbûyî.

Asê, gelek caran wek kûtê sê, kurdekî li pey nan.
Nan û jinan, xan û manan, di bîr tînim kanan gişan;
Ew giş wextekê bûn; vê gavê tek Tu yî şohret û şan. (Soneyên Sewdaser, r. 128)

1- Têbînîyek, Înan Eroğlu, çîrok, Avesta, 2019.
2 - Çîrokên Hejdeh Salan, çîrok, Şahînê Bekirê Soreklî, Doz, 2005.
3 - Soneyên Sewdaser, helbest, Kawa Nemir, Avesta, 2019

rupel 12+++:Layout 1 10.01.2020 21:40 Page 1

xwebûn

13-19 Çile 2020 / e-mail: rojname@xwebun.org / Buha: 4 TL Hejmar: 4

İmera Basın Adına İmtiyaz Sahibi: Kadri Esen
Sorumlu Yazışleri Müdürü: İdris Gürmez
Yayın Danışma Kurulu:
Abdulla Peşêw
Ehmed Huseynî
Kakşar Oremar
Prof. Knyaz Îbrahîm Mîrzoyev
Selîm Temo
Dr. Zerdeşt Haco
Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsiyar e.

Yönetim Yeri: Kooperatifler Mah. Gevran Cad. Akkoyunlu No: 5/13 *Yenişehir / Diyarbakır*
Baskı: Diyarbakır Yenigün Matbaacılık Selahattin Eyyubi Mah. Turgut Özal Bulvarı, Batıkent Yapı Koop. A/4 Blok Altı *Bağlar / Diyarbakır*

Serê salê



Aysel Tabak

1'ê çileyê we hemû cîhanê êdî di nav kurdan de jî wek sersal hatiye qebûlkirin. Lê ev edet ji bo kurdan hê gelek xav e. Em dikarin bêjin di nav kurdan de bêhtir ciwan vê sersalê pîroz dikin. Piraniya mezinên kurdan hê jî vê rojê wek edeteke xirîstiyanî dibînin, lewma jî pîrozkirina vê rojê wek guneh qebûl dikin.

Sersala gelê kurd a gelerî ku ji aliyê piraniya kurdan ve tê qebûlkirin 21'ê adarê, yanî Newroz e. Lê li hin deverên Kurdistanê di navbera hefteya dawîn a kanûnê û hefteya duyemîn a çileyê, bi xisusî 13'ê çileyê wek sersal tê pîrozkirin.

Mînak li Êlihê (Batman) 13'ê çileyê bi navê Serê Salê li gundan tê pîrozkirin. Li deverên wek Dêrsim, Çewlik (Bîngol) ku piraniya kurdên elewî kevneşopiyeke bi navê Gaxan heye. Gaxan, ji dawiya kanûnê heta hefteya duyem a çileyê didome. Li bakurê Tirkiyeyê, li devera Deryaya Reş ev kevneşopî bi navê "Kalandar" tê pîrozkirin. Wisa dixwiyê li van deran ji ber xelqên rûm û gurcî ev edet bi cih bûye.

Wateya 13'ê çileyê çi ye?

Merivan ji bo ku jiyanê û xwezayê baş fam bikin, jiyan û karên xwe bi rêk û pêk bikin demê li gorî salan, demsalan, mehan û rojan dabeş kirine. Di jiyana cotkariyê de dabeşkirina demê û plansazî, ji bo kar û barê hewce û girîng bû. Ji ber vê pêwîstiyê merivan salname amade kirine. Salname li gor tevdanên rojê an jî heyvê hatine amadekirin. Kurdan jî di wextên cuda de salnameyên cuda bi kar anîne. Yek ji wan salnameyan jî salnameya juliyen e. Sersala 13'yê çileyê li gorî salnameya Juliyenê hatiye qebûlkirin.

Ji berê de ji ber bi dawîbûna salê û hatina sala nû merasîmên gelêrî an jî olî hatine kirin û wek sersal hatine pîrozkirin. Niha jî ji ber ku li piraniya cîhanê salnameya Gregorian bi kar tînin sersal jî li gor vê salnameyê 1ê çileyê tê qebûlkirin û şeva ku 31'ê kanûnê derbasê 1'ê çileyê dibe tê pîrozkirin. Ev edet di nav kurdan de jî hedî hêdî bicih dibe.

Sersala kevin an jî gelêrî ya 13'ê çileyê li hin deverên Kurdistanê hê jî tê pîrozkirin. Her wiha li gelek deverên cîhanê ji aliyê gelên ji hev cuda jî tê pîrozkirin. Li gor cîhan û gelan nav biguhere jî bingeha vê kevneşopiyê yek e. Li hin deverên ku ev kevneşopî hebûye an jî hê didome.

Rûsya niha jî bi navê "Novy stariy god" (sersala kevin) her sal di êvara 13'ê mehê de pîroz dikin. Berê Sovyetê li Rusyayê ev roj sersala fermî bû. Gava dewleta Sovyetê ava bû ji ber hin sedemên mueyyen rûsan jî salnameya xwe guhert. Ji salnameya Juliyenê derbasî salnameya Gregorianê bûn. Ji ber vê sersala fermî jî guherî, bû 1'ê çileyê. Lê gel di şeva 13'ê çileyê de bi navê "Sersala Kevin" vê rojê wek sersal pîroz kiriye û hê jî ev edet didome. Di êvara 13'ê çileyê de xwarinên taybet çêdikin, dixwin û vedixwin. Hin tişt ji bo vê rojê qedexe ne. Mînak di vê rojê de kes deyn nade kesî. Heke deyn bide li gor baweriya wan ew sal dê bê bereket derbas bibe.

Li Abxazyayê bi navê "Axirnixuya" tê pîrozkirin. Li gor baweriya wan di vê rojê de dinya ava bûye lewma serê salê ye ji bo wan. Di vê şevê de goştê bizin û dîkan dixwin û şerabê ku teybet ji bo vê şevê ye vedixwin. Ji bo bereket û cansaxiyê dia dikin.

Her wiha li Ûkrayna, Yewnanistan, Romanya û li welatên Kafkasyayê heta li Afrîkayê jî hatiye pîrozkirin. Li Tirkiyeyê ji ber miletên rûm, ermen û miletên din ên xirîstiyan ev kevneşopî di nav gel de belav bûye. Mînak li bakurê Tirkiyeyê, li deverên Deryaya Reş ev kevneşopî ji ber xelqên rûm û gurcî di nav gel de bi cih bûye. Li van deveran ev edet bi navê "Kalandar" hatiye pîrozkirin û hê jî didome. Peyva "Kalandar" ji peyva latinî ya "calandae" tê û tê wateya 1'ê mehê. Di zimanên rojavayî de jî "Kalandar" an jî "Kalender" bi wateya salnameyê tê bikaranîn.

Dîroka serê salê

Tê bawerkirin ku pîrozkirina sersala 13'ê çileyê bi hezaran salan paş ve diçe. Hin kes dibêjin ku bingeha vê kevneşopiyê heta yewnaniya kevnar diçe. Di derheqê vê de du fikir hene. Li gor dîtina yekem bingeha vê sersalê meha "Gamelion" e ku di vê mehê de xwedawendên yewnanan Zeus û Hera bi hev re zewicîne. Ev periyoda meha Gameliyonê rastî navbera 15'ê çileyê û 15'ê sibatê tê. Sersal jî salvegera deweta wan bû. Ya din jî, dibêjin di vê meha Gamelionê de ji bo rûmeta xwedawenda şerabê Diyonîsosê şahiyek bi navê "Lenia" hatibû lidarxistin û sersal salvegera vê şahiyê bû. Bingeh çi dibe bila bibe lê wateya sersalê şahî, bereket û vejîn girîng in.

Di serdema Romayê de sersal bi navê "Kalende" bi şahiyên cur bi cur dihat pîrozkirin. Ev kevneşopiya "Kalende" piştî Romayê di serdema bizansiyan de jî didome lê bi motîfên xiristiyanî dikeve şiklek din. Bi têkilîyên xelqên xiristiyan û misilmanan bi demê re li deverên misilmanan jî belav dibe û her wiha dikeve çanda kurdan jî.

Kurd çawa pîroz dikin?

Awayê pîrozkirina Serê Salê li deverên kurdan ji hin aliyan ve dişibin hev ji hin aliyan ve cuda ne. Lê di nav kurdan de bi piranî ciwan û zarok pîroz dikin. Zarok û ciwan xwe dixin şiklên cur bi cur, ruyên xwe boyax dikin an jî tenî di rûyê xwe didin û di nav gundan de mal bi mal digerin ji bo şêniyên malê ji bo sala nû temeniyên xweş û baş dikin. Piraniya temeniyên zarok û ciwanên ku diçin ber deriyê malê li gor rewşa wê malê diguherin. Mînak, eger di wê malê de bûkek nû hebe dibêjin "Serê salê binê salê xwedê kurek bide bûka malê" an jî keçek ezeb hebe dibêjin "Serê salê binê salê xwedê qismetek baş bide keça malê". Xwediyên malê jî çi li ber destên wan hebin didin zarok û ciwanan. Exleb xwarin û fêkiyên hişkirî wek gûz, mewij, sêvên hişkkirî, tûyên hişkirî… Hin caran jî pere û noqilan didin.

Gotina Dawî

Sersal di jiyana mirovan da her wext ciyek girîng girtî ye. Her çi qas bi me wisa tê ku çanda me tenê teybetiya me ye jî lê ne wisaye. Di pêvajoya demê de gelek milet hatine bal hev, dan û sitandina çandî aborî û hvd çêkirine. Çanda sersalê jî bi têkilîyên miletên ji hev cûda ketiye nav hemû cîhanê. Û kevneşopîyên nû bi yên kevin ra didome. Wê bidome jî.

Hin gotinên serê salê

Serê dîk bi kulav e,
binê dîk bi kulav e
Xwedê kurê vê malê bike zave

Serê salê binê salê
Xwedê bihêle gir û hûrê vê malê

Serê salê binê salê
Xwedê bûkek bide vê malê

Serê salê binê salê
Xwedê kurekî bide vê malê

Kerku merku
Xwedê zarokekî ji we ra têx nava pû

Hûkê mûkê
Xwedê qîza vê malê bike bûkê

Lê li gor rewşa sîyasî van salên dawî ev gotinên ji bo sala nû jî diguherin, temenî û xwestek ji bo rewşa welat jî tên ziman. Wek "Serê salê binê salê xwedê azadiyê bixe vê/î axê/welatî". Em dikarin bêjin ku berê exleb li gundan dihate pîrozkirin lê van salên dawî êdî ji aliyên şaredarî, partî û komeleyên kurdan ve bi hin şahî û merasîmên wek şano, konser jî tê pîrozkirin. Serokên şaredarî û namzetên kurd jî tevlî van şahiyan dibin.

Qaqindosk, sersal, Gaxan, Kalik...

Di nav kurdan de li gorî deveran ji bo serê salê navên cuda hatine bikaranîn. Wek navên Gaqindosk, Kalik, Gaxan... Di derheqê Gaxana ku li Dêrsim, Çewlik û li deverên din ên ku kurdên elewî dijîn pîroz dikin, endamê Komaleyên Dêrsimê mamoste Cemal Yucel ji me re axivî. Li gor gotinên mamoste Cemal Yucel pîrozbahiya sersala Gaxanê li devera Dêrsimê me li nivîsa xwe zêde kir.

"Kevneşopiya Gaxanê bi çalakiyên cur bi cir dihat pîrozkirin. Ji ber ku wê çaxê salnameyek teqez tunebû li gor hefteyan ev çalakî pêk dihatin. Dîrokek teqez tunebû lê di hefteya dawiya meha kanûnê û hefteya yekem a çileyê de tê pîrozkirin. Bi zazakî bi navê "Sena Sona, Sena Nûweye" tê pîrozkirin. Yanî bi maneya dawiya sala kevin û destpêka sala nû tê pîrozkirin. Di bingeha van pîrozbahiyan de tesîra olê heye. Xwarinên ku jê ra "loqme" û "niyaz" tê gotin, dipêjin û belav dikin. Ev çalakî yanî belavkirina loqme û niyazan li gor baweriya olê ye.

Gaxan di hefteya dawî ya kanûnê û hefteya destpêka çileyê de tê pîrozkirin lê exleb rastî roja çarşemê tê. Roja sêşem û çarşemê rojî tê girtin, roja pêncşem û înê jî xwarinên li gor çanda me çêdikin. Xwarina ku di van rojan de tê çêkirin em jê ra "şerekut" dibêjin. Ji hevîrî tê çêkirin. Hevîrê li ser sêlên kevirîn di binê sêlê de dipetin. Xwarinek din "niyaz" e. Ew jî ji ar û rûnî tê çêkirin. Piştî pehtina van xwarinan milet derdikeve serê banan, li cem xwarinan çira pê dixin.

Zarok xwe dixin şiklê kalik û pîrikan, rûyê xwe tenî diken û li nav gund digerin. Diçin li malên cînaran skeçên ku jê ra "fadîke" tê gotin dilîzin. Şêniyên malê xwarinên ku çêkirine (niyaz) didin van zarokan. Ew jî piştî berhevkirina van xwarinan bi hev re parve dikin, dixwin.

Edetek din jî êvara înê xwarinek bi navê "sîrukut" dihat pehtin. Sê çiqil darên hûr diavêtin nav vê xwarinê. Yek ji bo cansaxiyê, yek ji bo perwerdeyê yek jî ji bo kesên ezeb qismet bû. Ji kê re derketana, ew gelek şa dibû.

Ev edet van salên dawiyê ji aliyên rêxistin û komeleyan ve li bajaran jî didome. Îsal li Duzgun Baba çalakiyek pêk hat, û loqme hat belavkirin. Komeleya çanda Dêrsimê jî îsal Gaxan li Stenbolê pîroz kir."